



Danerê Rojnameya pêşî a Kurdî
Miqdad Mithed Bedirxan

Armanc

Rojnameya Mehane

Hejmar, No: 127
Nisan
April 1992
Buha - Price
15 SKR, 3DM

Li Tirkiyê

Partiya legal a Kurd tê danîn?

Ev serê demekê ye li Tirkiyê munaqesa avakirina Partiyeke Kurd di rojevê de ye. Li ser vê yekê, ji gelek şexsîyetêne Kurd bigre hetta bi serokên partîyên Tirkan, bîr û rayêne xwe gotin.

Li gor agahdarî û beyanê ku hatine dayin, ji bo partiyeke Kurd gelek dîtin û meyil hene. Mesela li gor kovara 2000'e **Doğru**, ji bo avakirina Partiyeke Kurd behsa navê **Serafettin Elçi, Kermal Burkay**, HEP û 16 Parlamenteren Kurd tê kirin.

Serokê HEP'ê Feridun Yazar ji bo Partiya Kurd weha dibêje: "Pewistî bi partiyeke Kurd tuneye, cimkî HEP heye. Ji xwe ji destpêkê de ji HEP'ê re digotin 'Partiya Kurdan' û iro li Tirkiyê temsîlkarê gelê Kurd HEP e".

Serokê şûba HEP'ê ya Diyarbekirê Hüseyin Turhallı ji weha dibêje: "Partiya Kurd lîsti-

keke dewletê ye. Partiya me ne li gor milletan ava bûye, lê li ser esasê bekhevîyê, yekîtiya Kurd û Tirkan diparêze".

Li alîyekî din 16 parlamente-reñ HEP'ê jî ji derveyî HEP'ê dixwazin partiyeke nû ava bikin. Li gor beyanê wan "ev partîya nû jî wê nebe partiyeke Kurd. Ciyê herkesê ku bawerîya wî bi bîratîya Tirk û Kurdan hebe, di vê partiye de heye".


Grûba din ku **Serafettin Elçi** serî dikşîne, ew jî bi navê "Partiya Millî ya Kurd" dixwazin partiyeke liberal ava bikin.

Serafettin Elçi li ser vê yekê weha dibêje: "Nuha ihtiacya Kurdan bi partiyeke heye. Ji ber wê em dixwazin partiyeke Kurden Tirkîyê ava bikin. Ev partî dikare serxwebûna Kurdan neparêze, lê wê ne li dij kesen ku serxwebûnê diparêzin be jî. Bê guman ev partî

wê partiyeke demokrat be û wê şiddetê red bike. Ji bo vê partiye nuxta herî muhîm ew e ku wê bi tu de-rekê ve ne girêdayî be. Di vê partiye de her babet bîr û ray wê hebin. Sosyalîst jî, dîndar jî. Lê bingeha partiye wê prensibên demokrasîyê be. Heta nuha HEP'ê nekarîye bigota 'em partiye Kurda ne', ji ber wê jî heqê HEP'ê jî tuneye ku ji Kurdan re bibêje 'werin nav HEP'ê'....Herçend hewcedariyek mezîn bi partiyeke Kurd heye jî, lê qanûnen ku hene rî nadîn vê yekê".

Serokê ANAP'ê **Mesut Yilmaz** jî derheqê partiyeke Kurd de beyanek da û got "divê em bikarîn li ser partiyeke ku serxwebûna Kurdistanê diparêze jî munaqese be".

Her weha serokê SHP'ê **Erdal İnönü** jî got ku Partiyeke Kurd dikare bê ava kirin.



Kurd û Türk bîra ne!!

Li Kurdistana Iraqê hilbijartîn Kurdistan bi amblemê partiyan renga reng e

Zaxo (Armanc)

Piştî du car paşdexistinê, hilbijartînê Kurdistana Iraqê wê di 17ê Gulanê de bê çekirin.

Me sedemê çekirina hilbijartînê ji serok û berpirsyarê hin partîyên siyasi yê Kurdistana Iraqê pîrsî. Bersivîn ku dan me çi bigre wek hev bûn.

Endamê polît buroya Yekîtiya Nîşîmanî û cîgîrê Sekreterê Gişî Noşîrvan: "iro ji 6/5'ê Kurdistanê di destê pêşmerge de ye. Gelek problemen me yê bi rîvebirina vî welaî hene; problemen aborî, ci-vakî, eskerî û hwd. Ji bo çareser-kirina vê serkidayetiye, riya herî demokratik raya gelê Kurd e".

Serokê Partiya Demokratik a Gelê Kurdistan, Samî Abdurehman; "Nuha idare û bi rîvebirina Kurdistanê di destê Bereyî Kurdistan de ye. Gelek problemen ku li hîviya çareserkirinê ne ketine ser hev. Ji bona vê jî admînistrasyonek modern pêwîst e. Ji bo parastina her mîletekî ordiyek pêwîst e. Dema hejmara van ordiya bibin 2-3 kaos dest pê dike. Lî em nuha xwedî 8-9 ordiya ne. Her partiyeke Kurd xwedî siyasetekî ye. Ya rastir ew e mîlet bi dengê xwe siyaseta xwe hilbijere".

Endamê Komîta Merkezî û berpirsyarê enformasyonê yê Partî Demokratî Kurdistan, Felakeddin Kakeyî: "Nuha li rastê Kurdistanê ne azad heye. Ji her alî ve valayıya idareyî heye. Ji bo her mîletî yek serkîda (idare), yek temsîl û yek politîka hundurîn û yek politîka derveyî ya bi rîvebir-inê pêwîst e. Ev tişt hemû ji bo



Bîstek ji mitînga Mesûd Barzanî ya li Hewlîrê (Foto: Armanc)

Kurdistana azad jî pêwîst e. Ya rastir û demokratiktir ew e ku xelk bi xwe politîkaya xwe û berpirsyarê xwe hilbijere. Li qada navnetewî jî ev meşrûyet gelek girîng e".

Li Kurdistana Iraqê ev cara pêsiyê ye ku xelk bi awayekî demokratik wê here dengê xwe bide. Em rastî gelek kesen ku salê wan di ser 40'î re bûn hatin ku di jiyan xwe de tu carî deng nedane.

Digel ku tradisyonâ hilbijartînê li Kurdistana Iraqê tuneye jî, propogandayê hilbijartînê bi awayekî gelek demokratik dibin. Hemû partî bi azadî xwepêşandanê, propogandayê xwe, karêne xwe yê siyasi dîkin. Li hemû bajar û gundêne Kurdistanê xanî, darê eletrîkan û birc bi amblemê partîyên Kurd xemîlinê. Di hilbijartîna serokatiyê de 4 namzet, ji bo meclîsa Kurdistanê jî 8 liste hene. Her partiyeke Kurd xwedî siyasetekî ye. Ya rastir ew e mîlet bi dengê xwe siyaseta xwe hilbijartîye: Lista PDK-I (zer),

Yekîti (kesk), PDGK (kesk û sor), Partiya Sosyalîst (şîn), Partiya Zehmetkêş, Partiya Komünîst (sor), Partiya İslâmî (kesk û spî) û Tevgera Asûri (mor). Digel ku li Kurdistanê herkes çekdar e jî, lê pevçûnên siyasi çi bigre qet nabin.

Şiarê PDK-I bi piranî şexsiyeta Barzanî derdixe pêş: Wek numûne "Aşî, Azadî, Demokrasî", "Qerta Partiyê Zer e, Madem Mesûd Rêber e, Serkeftin Misoger (garantî) e", "Barzanî Nemirdîwa, Kak Mesûd Cî Girtîwa". Şiarê YNK; "Kerkük Kudsî Kurdistan e", "Yek Leşker, Yek Serkîda, Biraşî bo Hemû Kurda", "Mam Celal, Kak Noşîrvan, Bijî Kurd û Kurdistan". Şiarê PDGK: "Aşî, Azadî, Demokrasî, Federalî", "Kerkük Dilê Kurdistan e, Laş bê Dil Naji".

Dûmahîk r. 8

Li Tirkiyê Telewîzyona Kurdi

Mudûrê Grübê, Halit Tunç di beyana xwe ya li ser meselê de got "Me nuha bi 400 milyarı dest bi vê xebatê kir." Li gor agahdariyên H. Tunc, telewîzyon wê bi Kurdi weşanîn bike. Lî li gel vê, wê cî bide programên Erebî û Tirkî jî.

Telewîzyonek Kurd a xusûsî tê danîn. Li gor nûçen rojnaman wê sermiyanê vê telewîzyona xusûsî bi 400 milyarî Tirkîye be. Ev proje ji alî "Grûba Rojnamevanî Çapxanetî û Weşanî ya Amîd" ve ku nuha li Diyarbekrê rojnameyeke bi navê Söz(Götîn) derdixe tê meşandin.

Mudûrê Grübê, Halit Tunç di beyana xwe ya li ser meselê de got "Me nuha 400 milyarı dest bi vê xebatê kir, lê gava hewce be emê hîn jî zêde bikin." Li gor agahdariyên Halit Tunc, telewîzyon wê bi Kurdi weşanîn bike. Lî li gel vê, wê cî bide programên Erebî û Tirkî jî. Bi riya satelîten ku wê li Qerecdaxê û li Agriyê bêni bi cîkîrin, weşanîn telewîzyona Kurdi wê li 19 bajarê Kurdistanê û li hin herêmîn Kurdistanî Iraqê, Sûriyê û İranê bête temaşekirin.

Li alî din serokkomarê Tirkîye Tur-gut Ozal berî ku ji bo emeliyatê biçe Amerikayê got ku; divê di qanala telewîzyona GAP'ê de bi Kurdi weşanî bê kirin. Ev beyana Ozal di nav hemû partîyên siyasi de bû sebebî mûnaqşeyek mezîn. Rojnaman bi rojan li ser nîvîsandin, siyasetmedarîn Tirkan

dûrdirêj komantara wê kirin. Hinekan gotin; "Ozal bombayek destâ avêt nav Meclîsê" û çû. Hinekan ew bi "bêmesûlyeti" iîham kirin û hwd.

Ev yek, bû sebebî ku Ozal, beyana xwe li Amerikayê carek din dubare bike. Wi got, li Tirkîye hin tabû hene, ku kes newêre li hember wan tabûyan tiştekî bibêje. Mesela Kurd jî ji van tabûyan yek e. Li gor Ozal, heger dewleta Tirk iro vî mafî nede Kurdan piştî 10 salê din mesele wê hîn gi-rantir bibe. Cardin li gor Ozal, ev, mafekî pirr tebîye û li gelek welaî eqaliyeten wan xwedî vî mafî ne. Ü wek numûneyek din jî Ozal, Tirkîye nişan da û got ku ji xwe di telewîzyona Tirkîye de weşanîn bi zimanê İngîzî û Almani tê kirin. Ma çîma bi Kurdi wê neyê kirin. Ü ji alî qanûnî ve jî tu problem tuneye; heger hebe jî meriv dikane qanûnan biguhere.

Partiya Serokwezîr Demirel, DYP, partiya Turkeşî faşist û partiya Ecewît, Demokratik Sol Partî li dijî weşanîn bi Kurdi ne. Ecewît û Turkeş dibêjin ev "îxanet e", "perçekirina Tirkîye" ye, Demirel jî dibêje hîn "zû" ye, divê "em ji gel û ji dewletê biprisin, hela ka gel û dewlet tiştekî wiha qebûl dîkin ya na.

Partîyên din hemû, li gel ku di vî warî de xwedî dîtinê ne wek hev in, di telewîzyona GAP'ê de piştigiriya weşanîn Kurdi dîkin.

Di cephâ Kurdan de jî rojnama We-lat (hejmar, 11) li dijî pêşniyara telewîzyona Kurdi derdikeve û vê yekê wek berlîgirtina tevgera PKK'ê dîbîne.

Gaveke dîrokî ji bo hemû Kurdan

Di despêka nîvê dawî yê meha Gulanê de, li Kurdistanê Iraqê hilbiartın cedîbin. Hilbiartın Kurd gava herin ser sandogan wê ji bo avakirina du desgehen esasî deng bûdîn. Yek jî dengdara ji bo avakirina parlamentoyekî mill ya Kurdistanê Iraqê ye, ya din li bo serokaliya tevgîra rizgariya gelî Kurd e. Heger nave resmi yê vê muessesa dawîn ne serokaliya dawîtê (yan ji serokkomar) be ji bi rola xwe bi karûbarê xwe berpirsyanyeko wek wê hilige ser mîle xwe.

Hercî ne ji sedî sed di warekî azad û serbesî de pêkten p, ev hilbiartın bi vê serokaliya xwe ya heyi, di diroka Kurdistanê û hemû Kurdan de cara yekomin e ku wê bibin. Loma ji li bo me hemû Kurdan xwedî maneyek kür a dîrokî ne. Gava em daîa "serbesîtuna hilbiartınan ya ne ji sedî sed" dîkin, hebet destâ me ne ew e ku di hundurê welet de partî u hêzen siyasi yê Kurdistanê Iraqê ji all xwe de serbestiyek ji bo hev, ji bo hilbiartın Kurdistanê neanîne hoiê. Na, biles, di warîn nizgarkin de, teví newsa Kurdistan a gelek dijwîr li serbesî, azadiyek tevayî ji bo her partî u hilbiartıne Kurdistanî peyda bûye û herkes xwedî imkânîn wê yekê ye ku bi dîlarami û ewlîyî bir û bawenîyen xwe diyar dike. Ji partya komunist bigre heta partya İslâmî hemû bi serbesî li Kurdistanê kar dîkin û xwe amadevi hilbiartınan dîkin.

Yê ku siya tarî vedigire ser serbesî û azadiya hilbiartıne Kurdistanê Iraqê, tehdîda wan herçar dewletîn dagîker e ku mîle Kurd bi bin nîr zordestîya xwe de digirin. Rejîma İraqî berî herkesi hilbiartın nemesîn lan kinn. Türkiye, Iran û Sunîye herci heta nuba mewqufî rîbergirtina bi dare zorî nedîne ber xwe ji nerazîjûn û nerînîya xwe ya bîneq û hesab ekere diyar dîkin. Bi her fîrsîndê geta li Kurdistan dîxwîn ku wê tu carî qebûl nekin ku ev hilbiartın, nya serwebûne li ber mîle Kurd veke. Hebelî tîsa wan me ji wê yekê ye ku pistî hilbiartınan Kurdistanê Iraqê bibe weletîkî serbixwe. Ew bîxwe bas dîzîn ku gavek weha ne di roleve de ye. Lî ya ku tîse di dîlî wan de diffîne ew mesruyete ku pistî hilbiartınan wê di tevgîra rizgîrîwaza Kurdistanê Iraqê de xwe diyar bike. Ya din, bîvî nevî hilbiartın û encamîn wê tesirek mezin li ser parçayen Kurdistanê yê din li dîkin. Ji ber van hemû sedeman, her car dewletîn dagîker li desten xwe yêr dîrek bi dîzî yan ekere direkî hava hilbiartınan dîkin û dîbin sedemî tehdîdek eskere.

Nogek din, ji heye ku dîlîkîstîn, heyi û mixapîneke bal bi hilbiartınan ve tîne, ew ji ew e ku tevîbenî sesan veke Kurdistanê Iraqê hin di bin postalîn ordiya. Sedam de ye û imkâna wan a bescarbûna di hilbiartınan de nine. İro ji bo hemû Kurdan ciye ku i kovane ve ku xelkê Xanîqîne, Mendeliyê, Kertokê (yan li Kerkûkê mayî), Singal û Şexan, nikarin bi hemwelatîy xwe yê din re besdîn tayînînna qedera xwe bibin.

Tevi van ku i kemasî û tenidî û kovana ji di erîte rizgarîn yê Kurdistanê Iraqê de van rojîn pêsiye me dîbin sahîde bûyerîk gîriî ku cara pêşîn e wê di diroka Kurdistanê de ciye xwe bigre. Kurd îspat dîkin ku bes ne bi peyve galâ demokrasi û azadiye dîkin, le wek han û avê mîltaci demokrasi û azadiye ne li ya heri grangîr îspat dîkin ku dîkanî demokrasi. U azadiye bin û bidîn iyandin. Gava em binîn circa xwe ku cend hilbijartınan Tirkîye û yêr Israele ne li de, çavîn li mîleken Rojhilata Navîn di diroka xwe de li caran nebulune sahîde demokrasi û azadiyek wena, wê gaxê emîr cêtîr têbîghîn ku, hilbiartınan mîletekî wena, ja li perîsan û wardîjîwîr çôgas tayîq pêsi dayîne ne li çôgas maneyekê bilindî dîde dîkin.

Hebelî girîngîya hilbiartınan ne di vê maneyâ wê ya dîrokî de ye. Berî her tîşî mîle Kurd ji bo çareserkinra girûgîrtten xwe yêr troyîn û li bo rehbervekirna çareserkinra qedera xwe mîltaci van hilbiartınan e.

İro ji sesan pêncê Kurdistanê Iraqê hatîye rizgarînku zêdeyi 3 milyon insan tede dîpi. Bi hezaran problemen civakî, kulturi, abort, halbafî û yêr din û en ve civate hene ku bi bîmuessesi û bî sevîberi hayen çareserkinne. Bes desgehen partî, pêşmergayeji û yêr din ên wek van nikarin bi her awayî tîra, mîletekî bi rekûpeki temesînîn. Ne serbixe be ji li mîletekî re mîluessesi, desgehen dewletbûne, yêr Iraqîdîyarkîn û idarekîrîn dîven. Hilbijartın ga-vîn pêsi û zarurî ne ku iyanek wena li ber mîle Kurd veke û ev mîle kârîbe problemen xwe yêr rojana û yêr bi pêşerîja xwe ve gîredayî çareser bike. Bi wê hilbiartınan wê mîle Kurd serokîkî ji bo xwe hilbijartîne ku idara hundurê welet bike û di warî navînetî de temsîla mîle Kurd bike. Mecîsa ku bî hilbiartın wê qanûnan derxe, hukumetekî avabilek û bibe ciye heri bîlînd e bîraren bi dedera mîle Kurd û Iraqî idî wê ne organîn partîyan yan yêr cebîne bin, idî wê ev meclis bi xwe be ku endamîn wê li all mîle û bi dengdînek azad hatîye hilbiartın. Ev meclis wê bîraren bide ku li Kurdistanê Iraqê otomoni yan federalî û avakîn yan li Kurd serokîve bîjî.

Ey ji alîyekî dî... ji alîyekî din, hilbijartın bi xwe encamîn ci dîbin bîla bibin, kî dîkin serok yan kîjan partîye dîkin piranî bîra bikin, ew bi xwe di bin referandumek gete Kurd ku wê mesruyeta tevgîra rizgarîwazîya gete. Kurd a bi hemû alîyekî xwe ve li ber çavîn hemû cinanî tesbit bikin. Tevgîra rizgarîwazîya gete Kurd, bi cebhe û hemû partîyen xwe ve li ber çavîn hemû dînyayê wê bibe temsîkîrê qanûni yê gete Kurd. Mesruyît û qanûnîyetekek wiha bi serî xwe tenê ji sebîbîn bes in ku çima ev hilbiartın pêk tîn. Pîşî hilbiartınan idî ne hîsan e ku Sedam û yêr wek wî karîbî, navî tevîzîmî, nokenya filan yan bîvan dewletî binin ser tevgîra Kurdistanê. Ew mîhawî-lik wiha bikin ji idî ne hîsan e ku rayagîşî ya dînyayê gun bide peyvî weha vala û pîc.

Yek ji nûqtan ew e ku menî karîbe diyar bike, ev hilbiartın ne ku bes li bo Kurdistanê Iraqê, li ji bo me hemû Kurdan xwedî neverokek dîrokî ne li tesirek girîng dîkin li ser iyanâ me ya troyîn. Biserkeftîne hilbiartınan û pêdeçûna li gor perspektifîn wê li Kurdistanê Iraqê wareki ji bo me hemû Kurdan pektîne ku emî karîbîn pîyên xwe li serî deyîn û gaven xwe pêde bavêjin. Betki me baş hay jê nine, idî bi serketîna van hilbiartınan sitargeha me hemû Kurdan ava dibe.

Lihevkirina Tirkîyê bi Sûriyê re

Wezîre Karûbarê Hundir yê Tirkîyê İslmet Sezgîn îcar ji Sûriyê dest vala nezivîrî. Li gor Pressa Tirkîyê, Tirkîyê û Sûriyê li ser "terora" PKK'ê li hev kirine û di navbera wan de hin peyman ji hatine imzekerîn. Li gor vê peymanê wê herdu dewlet li diji terorîzmê parastina sînorê xwe zêde bikin. Sûriyê wê PKK'ê wek rîexistîneke neqanûnî ilan bike û dema ku mensûbêne wê bigre, wê wan tewqîf bike.

Ya heri girîng ji bo Tirkîyê ew bû ku, cara pêşîn e Sûriyê bi awayekî resmî hebûna PKK'ê li Sûriyê qebûl dike û wan ne qanûnî ilan dike.

Peymana ku di navbera Sûriyê û Tirkîyê de hat imze kirin, zû encam da. Li gor nûçeyen ku ji herêmî tîn, PKK kampa Bekaayê terk dike.

Wek tê zanîn problemen dîrokî yê Sûriyê bi Tirkîyê re hene; mesela Hatayê û mesela ava Diçlê û Firadê problemen esasîne. İro Sûriyê ji %80 ava xwe ji Firadê digre. Pişti ku projeya GAP'ê tîkeve fealîyetê, Sûriyê wê karîbe bi tenê ji %40 ji vê avê feyde bibîne. Ji ber wê ji Sûriyê dixwaze li diji Tirkîyê tiştekî bike, ev ji wek xuya ye wê di pîrsa PKK'ê de rola xwe bilize.

Lî ji alîyekî din ve ji Sûriyê di konjuktura dinya iro de bi tenê maye. Dostîn wê hindik in. Amerika û dewletîn mezin yê Rojava, Sûriyê wek dewleteke terorîst dibînin û welê xuya ye Sûriyê ditirse ku sibê ev dewlet li diji wê ji ambargo deynin. Di vî warî de sînyal ji hene; çendekî berê 69 senatoren Amerîkî ji Sûriyê re nameyek protestoyê şandibûn ku dev ji terorîzmê berde.

Herêma Rojhilata Navîn bi pîrs û pîrsîrêkîn xwe ve, herême meke tevlihev e. Rejîmîn vê herêmî ji bi piranî diktator in û serokîn wan ji heta sax bin, li ser hukum in. Ü Kurd di nav vê herêma tevlihev de şerî azadiyê didin. Kurd wexta têkoşîna şerî çekdarî dîkin, bîvî-nevî ji dewletek din ku Kurd di bin nîr wan de ne, alîkarî distûnîn. Ü ew alîkarî ji dîbe qoz, dikeve destê wan dewletan û ew ji da ku problemen xwe bi dewletîn din re hel bikin, vê qozê bi kar tînin. Lewra divê di vê herêma tevlihev de rîexistînê Kurd bi hostaû politîkayê bîkin.

Rapora Heyeta SHP'ê "Hêzîn dewletê gel gullebaran kir"

Ji bo tetkîkîrîna bûyerîn Newrozê Partiya Sosyal Demokrat a Gelî (SHP) berpirsyarê malî Ziya Halîs, alikarê Sekretekerî Giştî Ercan Karakaş, endamî komita merkezi ya birêvebir Mustefa Gazalci, û parlamenterî Meletî Mustefa Yılmaz wek heyetekî şandibû Kurdistanê. Heyet di gerra xwe ya çar rojan de cû Diyarbekirê, Cizîrê, Nîsîbinê, Şîrînê û Mîrdînê; li van bajaran bi gelek kesen ku bûbûn şahîden bûyeran re peyîvin, ditin û komentârên wan yê li ser bûyeran fîr bûn. Dû re ji di vî warî de raporek bi navê "Rapora SHP'ê ya li ser Bûyeren Newroz 21'ê Adara 1992'an" pêşkêsi partîye kir. Di vê rapore de tê gotin ku:

"Beşek ji hêzîn dewletê di tevger û bûyeran de xelkê sîvî gullebaran kirine û bûne sebebî xînîrîjandin û firehbûna hedişan."

Li ali din tê gotin ku "bi gotinê qebûlkîrina realîta Kurd ne bes e, ji bo çareserkinra gelşa Kurd divê guherînê qanûnî bîn kirin."

Di rapore de ev daxwazîn jî hene:

-Divê efûyek giştî bête derxistin.

-Divê İdara İstisnaî, Waliyê Herêmî û sistema Milisen Gundan bîn rakirin.

-Qanûnîn ku nahîlin bi azadî mîrov navan li zarokîn xwe kin, divê rabîn, û ew gund û herêmîn ku navê wan hatîn guherîn tavîlê navê wan paş de bîne dayin; di vî warî de guherîn qanûnî bîn çekirin.

-Ji bo danîna ensîtitutuyen ziman û kultura Kurdi divê di qanûnan de guherîn bîn çekirin.

-Qanûnîn ku rî li ber fîrkîn û pêşdebirina Kurdi dîgrin divê bîn rakirin.

-Divê "sûcê propagandayê" rabe.

-Di telewîzyona GAP'ê û istasyonên radyoyê de divê programen bi Kurdi bîn weşandin.

-Cinayetên qatîlen wan meçhûl divê bîn ronkirin.

Balafîrê Tirk serê rojê Kurdistana Başûr bombardûman dîkin

Balafîrê Tirkîyê disa Kurdistana Başûr bombardûman kirin. Di 14'ê Nisanê de balafîrê Tirk yê herbê ji Diyarbekir û ji Meletîyê bi hewa ketin û carek din li Kurdistana Başûr, li herêma Behdîna newala Durjî bi seitan bombardûman kirin.

Dewleta Tirk vê carê ji wek her car li herêmî hebûna kampê PKK ji êrisen xwe yê hewayî re wek sebep nişan da.

Êrisen ordiya Tirk ên bi vî rengî ji sala 1985'ân û virde ye dest pê kirine. Li gor beyanîn hin mesûlîn eskerî, heta huha ordiya Tirk 16 caran êrisen bîriye ser Kurdistana Başûr. Di van êrisen ordiya Tirk de li gel zirarek mezin a maddî, bi dehan ji xelkê sîvî hâtine kuştin.

Nuha ji sînorê Kurdistana Başûr tê mayinkirin

Ordiya Tirk ji bo ku bi tevayî rî li ber çûyin û hatina di navbera Kurden Kurdistanê Tirkîyê û Iraqê de bigre, nuha ji sînorê Kurdistana Iraqê mayin dike. Wek tê zanîn berê ji, her bi vê armancê sînorê Kurdistana Sûrî mayin kiribûn. Li ser sînorî her sal bi sedan kes birîndar dibin û tîn kuştin. İcar ji bo ku di navbera hêz û Kurden Kurdistanê Tirkîyê û Iraqê de ji çûyin û hatinê qu tîn, vî sînorî ji mayin dîkin. Li gor beyana Korgeneral Necati Özgen, xwedêgîravî herêma ku bêtir çûyin û hatin lê çêdîbe û hêzîn Apociya her tim wek rî bi kar tînin herêma gelîye Şerînê, Çemî Hîzîl e. Cardin li gor Özgen, berê ji ciyekî bi qasî 65 km hatiye mayinkirin û heta dawiya salê wê ciyekî nemayinkîfî nemine.

Civîna Enstituya Kurdi ya Parîsê

Ji 10 heta 1986 meha Nisanê li Swêdê, li girava Biskopsarno yê civîna 11'an a li ser zaravayê Kurmancî hat çekirin. Civîn ji teref Enstituya Kurdi ya Parîsî hatibû amadekirin ku li ser pîrs û pîrsîrêkîn zara ve Kurmancî bû.

Wekî tê zanîn Enstitu salê du caran civînen weha yê li ser zaravayê Kurmancî amade dike û pişî her civînekî ji bi navê Kurmancî rojama nefîca civînê derdix.

Civîna isal li ser termîn perwerdekarî, leşkerî û huquqî bû. Her weha di civînê de peyvîn ku di klasîkîn Kurdi û rojname û kovarîn wek Hawar, Ronahi de derbas bûne ji hat sekinandin. Civîn her roj ji 8.30 û sibî heta 21.00 û êvarê dewam dikir.

Li ser navê Armancê Z. Xamo û M. Lewendi besdîrî vê civînê bûn.

Kesen din ûn besdîrî vê civînê bûbûn ev in: Elîser, Hamit Kîlîçstan, Kendal Nezan, Lutfî Bakî, Mehmet Uzun, Mehmet Tanrikulu, Mahmut Bakî, Muzeffer, Rojen Barnas, Reşo Zîlan, Xusro Abdullâh, Veysi Zeydanî, Z. Abîdin Zînar, Zînar Soran.

Armanç
Rojnama Kurdi ya mehane
Monthly Kurdish Magazine
Redaksiyon:
M. Eli
Zinarê Xamo
Hesen Mizgin
Mirza Bextiyar
Lewend Fîrat
S. Rêving
M. Lewendi
Redaktör berpirsyar:
M. Eli
Berpirsyarê beşê
Dimiliği: Malmisanjî

Adres :
Box: 152 16
161 15 Bromma
Sweden
Telefon
46-8-803135
Telefax:
46-8-801825
Ansvarigutgivare:
Kurdiska
Demokratiska
Arbetar Unionen
Postgiro: 50 37 99-9
ISSN: 0348 7385

Abonefi
Prenumeration
Abonetiya Salekê
Li Skandinaviya
150 SKR
Magam
Myndigheter
250 SKR
Li Ewrûpa
50 DM
Li derveyîl Ewrûpa
40 \$
Anons/lîan
nîv rûpel/ en halvysidan
2500 SKR

reportaj

- Bi xêr hatin! Hûnê kûda herin?
- Zaxo
- Ji kerema xwe re huwiyetên xwe derxin
- Fermo!
- Di sindoqê(bagaj) de tiştek heye.
- Na xêr
- Zahmet nebe sindoqê veke...Spas. Riya we ve-kirî be

Piştî ku me bi bo-teke piçük li çemê Dicleyê xist, em derbasi Kurdistana azad bûn, bi otomobilekê ketin ser riya Zaxoyê. Li ciyê kontrolê pêşmerge sekinibûn. Ev diyaloga jorîn li her noqteke kontrolê dubare dibû.

Pêşmerge de her ketin û derketina bajaran de, li ser riyên stratejik kontrola huwiyetê dikirin û tîrimbelan saxî dikirin. Bi zimaneki şérîn û bi şîklikî ciddî. Lê çend cara ez bûm şahdî ku pêşmergan nikaribûn Latîni bixwendana, bes wek usûlî pasapor-tên me dînihîrin.

Kurdistan ne ew Kurdistana ku Mûrad Ciwan di havîna çûyîn de ziye-ret kiribû û pênc hejmarên Arman-cê de bi awakî jîndar li ser nivîsan-dibû. Nuha dizi, tevlihevi û kaosa par nemaye. Hewlîr êdî ne giraveke azada di bin kontrola Iraqê de ye. Pêşmerge di her firstetê de noqteyeke nuh ji des têne leşkerên Seddam distin. Nuha ji bi firehî ji hudûdê Sûriyê heta hudûdê Iranê, bi kûrayî heta 20-30 km ji başûrê Hewlîrê heta Silemaniye di bin kontrola pêşmergeyan de ye. Axa Kurdish a ku nuha di bin kontrola Iraqê de ye, Kerkuk, Mendeli, Xaniqin û hinek deveän li derûdorê Musûlê ne.

Mesela Kerkükê bûye propaganda hemû partîni. Hemû partî daxwaza Kerkükê dikir. Li gelek ciyan çavêne me bi bandrola "Kerkuk dilê Kurdistanê ye, laş bê dîl najî" dîkevin.

Hemû dibistan vekirî ne. Xwendin li ser metod û pirtûkîn kevn dom dike. Min ji mamesteke pirsî; "Ev pirtûk II gor ideolojiya Baasî hatîye amedeke-riñ". Wî got; "Belê kaka, lê em wî besî bi xwendevan nadin xwendin. Di demek wiha kurt de imkanen me tunene ku em pirtûken nuh hazir bikin." Ne tenê li ser pirtûkan, her wisa li ser deferîn nivîsî ku li dikanan tê firot jî sûretê Seddam heye. Lê ji neçarı ew têne firotin û kirin. Nuha hemû teşkilatên dewletê û yên belediyen li gor imkanen xwe dixebeitin. Muesesa avê, elektrîkê û maliyê û hwd dixebeitin; kadroyen wan bi giranî yên kevin in. Berê di bin kontrola Bereyî Kurdistana de ne. Em şevekî li Zaxoyê li malekê mîvan bûn. Min ji xwedîye malê pirsî; "Xalo tu bi xwe perê elektrîkê didî an têne ji te dixwazîn!" Xwedîye malê digot; "Min heta nuha nedida, çimkî pere ji Seddam re diçû. Çiqas dihatin jî min ew diqewitandin. Lê ev du meh e di bin kontrola bere de ye, ez didim. Min bihist ew perê ku min meha berê dabû ew ji gîhiştiye Sed-dam, lê ya vê mehê gîhiştiye maliya Berey Kurdistan."

Jiyan li Kurdistanê ji Iraqê erzantir e

Li Kurdistanê bi zehmetî be ji hemû



Dewleteke bê al: Kurdistan

Mîrza Bextiyar / Zaxo

MEYDAN

Pivana azadîxwazî û demokratbûyîni Partiya Kurd

Salim Çeliker

Di warê legal de xweorganizekirina Kurdan tim bûye mewzuya munaqeşê. Yênu ku di vê munaqeşê de cih distin û li dij partîyê legal yêndi. Kurd dertê, mirov dikare bibêje ku du teref in. Terefek jê dewlet e ku bi qerekterê xwe ya kolonyalist tim xwestîye râ li ber Kurdan bigre, ji bo ku nikaribin heqen xwe bi serbesti bi kar bînîn û mecbûrê illegaliteyê bibin. Dewlet, bi tesîra guherandînen navnetewî û yêni li welêt, iro mecbûr bûye ku hin heqen bide Kurdan, lê cardin ji di nav fîlbazîyekê de ye. Ji bo ku "Kurd nebin eqellîyet", li gor dewlete, divê ku Kurd dev ji hinek heqen xwe yêni esasi berdin!

Terefê din çepen Tirk û hin Kurden me ne. Çepen Tirk, tevgera Kurd ji bo xwe tim wek payende ditine û li dij organizebûna Kurdan derketine. Do, wexta ku Kurdan komele ji ava dikirin, cardin ji di binê êrisen ideolojik ên çepen Tirkan de bûn. Ev şela wan ya do ji û ya iro ji, ji tesîra Kemalizmê û ji hessasiyeta wan a parastina "misak-i millî" tê, loma ji heta ciyekî mirov wan fam dike. Lê Kurden me yêni di vê cephe de...? Gelo ji bo ci ew li hember partîyên serbixîn yêndi Kurd derdi Kevin?

Bala xwe bidinê Kurden me gi dibêjin.

Serokê HEPê Feridun Yazar: Avakirê Partiya Kurd a ku ewê ji nû ve were danîn, dewlet e. Di eslê xwe de hewcedarî bi partîyeke din a Kurdi tuneye. Ji roja em hatine danîn heta iro ji bo me 'Partiya Kurd' tê gotin.. (2000'e Dogru, hejmar, 15, 1992)

Rast e, ji bo HEPê "Partiya Kurd" tê gotin; lê, Feridun Yazar ji tê de "heta iro" tu berpîsiyareki HEPê tu caran ji bo xwe ev sifata jorîn bi kar neanî ye. Bilekis, di her keysê de xwe wek partîyeke xelkê Tirk û Kurd dane nişandan û xwe amadeyi muxalefeta Tirkîye ya demokrasîye kirine. Ange-jebûyîna bi hinek çepen Tirk re ku di warê siyasi de ew marjinal in, damez-randina réxitineke nuh, ji perçeyek ji vê perspektifî ye.

Li aliye din, bûyerên ku bûn sebebê xulqandina HEPê li ber çavan in. Ger ku ev parlamenteñen Kurd ji SHPê nehatana avêtin, bi ihtimaleke mezin, wê partîyeke bi navê HEPê ji tunebûya. HEP bi misyonike, ku pîrsa Kurd çareser bike, derneket. Bi vê manê, HEP, ji aksiyoneki zedetir, reaksiyon e. Bê şik, ev destpêk dikaribû bikemiliya û him bi perspektifîn xwe yên siyasi û him ji birîn xwe rengekî Kurdistanî bistenda. Lê mixabîn ev pêk nehat. Gelek balkê e, kongra HEPê a duym, dema ku Ozal di got "divê federasyon ji bête munaqeşê kirin", ciyiya. Gelek kes ji kongrê li hêviya bersîvekê bûn. Lê kongrê ji dîlva wê ve, bi fetsandina ditinê cihê û avêtina hin sloganên ne realist ve meşgûl dibû. Loma ji HEP ji "temsîlkirine" dûr e. Em bibêjin HEP bi xususiyetîn xwe partîyeke Kurd be ji, cardin, heqê tu kesi tuneye ku rê li ber azadiya danîna partîyên din bigre û bi termenî ne li ci iitham bike.

Kurdeki me yê din, Mahmûd Kîlinç, li ser navê hevalen xwe yên parlementer yêndi ku ji SHPê vejetiyane di mesela partiye Kurd de ditin xwe dibêje. Li gor rojnama Milliyetê a 26'ê Nisan a 1992'an, Mahmûd Kîlinç damezrandina partîyeke Kurd bi paşverûtiyê iitham dike û wiha dibêje: Réxitina ku emê ava bikin wê réxitineke siyasi ya wisa be ku karibe hemû xelkîn Tirkîye di bin baskê xwe de bîcîvîne. (.....) Em ne ew kes in ku insana di her warêni jîyan de li gor esasî millî ji hev vejetin.

Ev ditin, ji bili bê perspektifbûna Kurdistanî, di eyni wextê de redda qonaxa fikri ku tevgera Kurd anîye wucûd ye ji. Prosessa xebata fikri li dijî erîşen nîjadperest û şovenen Tirk ev pîrs di warê ditinê de çareser kribû. Ji nuh ve munaqeşa gelşen wiha şerpeziyeta fikri û paşdexistina merhelê ye.

Dema Mahmûd Kîlinç van tişten li jor digotin partîyen hukûmete di haziriya guherandîna qanûna esasi û ya partîfamezirandin da bûn. Dil dixwest ku, Mahmûd Kîlinç, ji dîlva ku damezrandina partîyeke Kurd bi paşverûtiyê sîcdar bike, bi şîlêke Kurdistanî li hember tasaryen hukûmetî, azadiya danîna partîyan li Kurdistanî biparasta û li guherandîna van qanûnan bi awakî musbet tesîr bikira.

Parastina vî heqî pîvana azadîxwazî û xwedî perspektifbûnya avakirina civateke mîli ye. Ew kesen ku vî heqî wek prensip, perçeyek ji azadiya xweorganizekirinê nebînin û nemaze di vî şerîte esaretê de vê neparézin, wê gavê divê meriv ji demokratbûyina wan şuphe bike. Pîvan, di eyni wextê de pîvana perspektifâ avakirina civateke mîli ye; civata Kurdistanê a pêşerojê wê li ser partî û institutîn(dezgeh) demokartîk ava bibe. Loma ji ji nuha ve divê gavên wisa werin avêtin.

Li aliye din bi gelek tecrûba teyid bûye ku xebata ilegal, bi navê xweparastina ji polîs, bûye izolekirina kadroyan ji xelkê. Ji 12'ê llonê vir de yêndi ku bûne pêşevanê xelkê, ew kadroyen ku di aktivîten legal de bûne. Li aî din, armanca xebata siyasi ya ku me divê ji xwe avakirina civateke legal (sivîl) e. Eşkere ye ku illegalîte, zedetir, li qerekterê réxitinê komîtaci, elît û eskerî tê.

Rewşa huquqî ya Tirkîya iroyin ji bo partîyeke me divê, ne musait e, lê, râ li ber xweorganizekirinê ji nagre. Ji xwe armancek ji xebata siyasi ji guherandîna şertan e. Hêzîn Kurd divê ku xwe amadeyi xebatek wisa bikin û partîyeke damezirinîn.

Partiya legal ya Kurd divê Kurdistanî be: Çareserkirina pîrsa mîli a xelkê Kurd li ser axa xwe û rîvekirina li peşveçûna hemû insanen vê civatê hedefike wê ya esasi ye.

Ev partî divê demokrat be: Ji bo jiyanekî azad ku her sinif û tebede, bikaribin xwe di warê siyasi de ifade û organize bikin, dixebeitê û di nava xwe de demokrasiyê pêk tîne.

Ev partî divê xwedî insiyatîf be: Di çareserkirina pîrsan de ne "navbençî" lê rast e rast teraf be.

RAMANÊN RAMANWERAN

Divê li pişt partî û rêxistinê legal rêxistinê ilegal tunebin

Berî her tiştî, gerek em bînîn bîra xwe ku, eger mîletek, xelkek, çînek an jî civatek hebe, divê nûnerên wan yên siyasi, rêxistin û partiyêwan jî hebin. Ev tiştî tebii ye. Ger ne wisa be an jî jiyaneka li dijî van tiştîn tebii hebe, ev nîşan dide ku hinek astengen vekirî, an jî dîzi hene.

Jî bo vê jî bersîva pîrsa we, dixwazim bi kurtî wiha bidim: **Partiyê Kurdi yên legal, divê di jiyanâ Tirkiyê ya siyasi de ciyê xwe bigrin.**

Lê belê, pîrsen civâsi û siyasi gerek bi kûrayî û pîralî bêne lêkolin. Wisa nebe, dibe mîna anketen rojnamevanan, wek pîrs û ber-sîv bi çend gotinan bêz zîmîn. Bi vî tehrî meriv nikare bi-gihêje qerareke bi dilê xwe. Munaqeşe û dîtinêni li ser partiyê Kurdi yên vekirî damezirandin ne hêsa ye. Meriv nikare her tim bi serê xwe bibêje "de bila partiyê Kurdi jî bêne damezirandin", an jî, "de werin em partyeke Kurdi çêkin." Tiştî wiha, gelo têra ci dike?

Ew kesen ku, bixwazin partiyê wilo damezirinîn, gelo jî bo bersîva "mesela Kurdi" rîyeke çawa difikirin? Program û pêşniyarêwan ci ne? Ev noqte, bi kêmânî bi qasî damezirandina partiyê girîng e.

Hemû rîbaz û metod di hemû şertan de nayêni bi kar anîn. Wexta ku em van gotinan bînîn bîra xwe, wê çaxê, ev şertan ku em tê de dijîn, gelo hewcedariya kîjan rî û metodan nîşanî me dide? Gelo metod û rîvajoyêni partiyêni wiha, wê çawa bin? Gerek em jî bîr ne-kin, ku Kurd civateka geleki perçebûyi ye. Ji civata wiha jî, geleki partiî derdikevin. Lê belê em bi maneka civatî, ji van re dikarin bêjin partiî, an na? Ev jî tiştîkeku munaqeşe û axaftinê dixwaze.

Li gor ditina min, rîvajoyeka nû li pêşîya Kurdan e. **Kurd ger-ek ji vê hevbelavbûnê xelas bibin.** Nêzî hev bibin, hevdû fêm bibin, guh bidine hev. Ger ku Kurd ji vê tengasiyê derkevin, wê çaxê rêxistinê bênenxwesî wê bêne damezirandin. Riyen nû, wê bêne vekirin. Ger wisa nebe, wê çaxê wê di ciyê komele û partiyêni dizî de ku serê 15-16 sal berê hene, partiyêni piçûk yên "legal"-vekirî wê bêne damezirandin. Ev hal jî tu giranbuhayikê bi xwe re nayne. Dibe ku jî berê jî xirabtibibe. Berê partiî bi dîzi bûn, meriv bi kêmâsi û nexweşiyêni wan pîr nedîhesiya, lê, dema ku partiyêni vekirî hatin holê, meriv nexweşiyêni wan yên zaroktiyê pîr baş dibîne.

Em ji nuha ve dibînin, hin grû-ben ku ji derî xwe kesî nabînin, teng difikirin, ne bi dîtin û ne bi jiyan qet nehatine guhertinê, hîn jî bi hewcedariya kesî nebawer in, bê munaqeşe û lêkolin, dixwazin partiyêni wiha çêkin.

Li pişt partî û rêxistinê legal divê rêxistinê dizî-ilegal- tunebin. Ev metodeke kevn e, ne demokratik e, civatan pêşde nabe. Tehrekî Stalinisti yê. Mirov

bixwaze û nexwaze diktoriyê û dekûdolaban bi xwe re tîne. Civata me Kurdan ev metod hin terk ne-kiriye. Belê kêm bûye, lê hê jî heye. Me berî demekê kurt, mîsalen wê dîtin. Ne hewce ye bi nav bikin. Partiyê vekirî bi dîtin û bawerîyan dikarin bêne damezirandin, wisa nebe, meselîn nû dîkin bela serê civatê. Ev kêmasiyeku, tiştîn wiha di nav civatê de nehanîn xeberdan û munaqeşe kirin.

Lewra dibêjîm ku, gerek ev mesele bi piralî bê xeberdan û bê zelalkirin.

Lê belê dema ku mesûlîn siyasi û civatî di nav mîletekî, di nav geleki de hebin, ji bo organîze-bûna wê civatê, gerek meriv ji cîkî dest pê bike. Yen ku heta nuha hatine cî jî, perçek ji vê riya dirêj in. Di nav van rî û dîtinan de "partiyêni legal" jî hene. Him jî ciyekî bi taybeti. Civatê din, çawa hîn bûne? Wexta ku jî diya xwe bûn, rêxistinê hazir ne li hêviya wan bûn. Ev gelê din, mîleten din jî di riyan wek van riyan re derbas bûn. Rîvajoyêwan jî dûr û dirêj, wek yên Kurdan bûn.

Jiyan dersdar û mamosteya herî jîr e û bêinsaf e, çawa hîn hemû kes û mîletan dike, wê hîn Kurdan jî bike.

Di van salen dawiyê de, hin rêxistinêni civâsi, wek partiyêni fonksiyon bi cî anîn û bi ser jî ketin. Hin rêxistinêni wiha, di welaten Rojhilata Ewrûpayê de, di nav rîvajoyê de paşê bûne partî. Dixwazim bîjîm ku, metod û fonksiyon geleki girîng in, bi kêmâsi, bi qasî çekirina partiyêni wiha girîng e.

Bi dîtina min, gerek meriv ji reçetîni siyasi, ji pêşniyarêwan wek reçetan dûr be. Gerek ev kar, ev mesele di civata Kurdi de bê xeberdan. Him jî bêtirs, wek kesen civatê modern, pêşveçûyi. Divê kes ji kesî netirse. Bi hev re nekevine ceribandina netewetiyyê. Bê kompleks, gerek hertiş bê zîmîn.

Wek, Kurd ku partiyêni xwe damezirinîn, ev partiyêni Tirkiyayê, wê bi ci tehrî bêne guhastinê. Wê rîyeke çawa bidine pêşîya xwe? Wê bi ci tehrî hereket bibin? Gelo meriv dikare bêje, "de ci dibe bila bibe?" Kurd û Tirk di partiyêni xwe de, ji bo gelêni xwe û gelêni din, wê bi ci tehrî xebatê bibin? Wê di nav gelê xwe tenê de bixebeitin an na, sînorê xebatê wê çawa bibe? Gelo li hember hev sekinandin, wê zêde bibe an na? Di dawîya van guhertinan de, kar û zerera Kurdan wê ci be? Tirk, Kurd û gelêni din wê jî hev izole bibin an na?

Ji van girîngtir jî, Tirkiyê nikare demokrasiyê pêş de bibe, dema ku partiyêni Kurdi yên vekirî bêne damezirandin, gelo wê çiqasî alîkariya vê rewşê bike? Demokrasiyê wê pêş de here, an tengasî wê hin zêde bibin?

Dirok û hînbûnîn demokratik di rêxistinê Kurdan de kêm in, me-

□ Naci Kutlay

riv dikare bêje nêzîki tunebûnê ye, partiyêni Kurdi yên ku wê bêne çekirin, gava ne hemdemî û modern bin, gelo wê çiqasî alîkariya pêşdeçuyina gelê Kurd bikin?

Lewra heta ku bi dûrûdirêjayî lêkolin û munaqeşe nebe, "belê bas e", an jî "na nebas e" gotin bi a min neheqî ye.

Dixwazim bêjîm, Armancê li ser vê babetê axaftin hanî holê, ev tiştîki pîr bas e. Lê belê çerçewa wê, gerek van sînorêni ku min li jorê got, derbas bike, fireh bibe.

Nuha hat bîra min, sal an jî salûnîvek berê bû, rêxistina siyasi ya ku Armanc xwe nêzîki wê dibîne, li ser girîngiye partyeke sosyalist a Kurdan disekeinî. Dema ku partiyêni Kurdi yên vekirî bêne damezirandin, bîbê-nebê ev dîtin wê disa bê ortê. Ev dîtin bi xwe jî nehate xeber danê. Nizamîn çîma, civata me hin tiştîn pîr xeber dide, hinekan jî xeber nade. Xeynî van, li ser geografiya ku em lê dîjin, gelê din jî hene. Kurd tevi wan dîjin, ev rewşa jî faktoreki mezin e. Hinék jî girêdayî van gelan e. Em nikarin vê bûyerê jî bîr bikin, ne di destê me de ye. Wek ku, destûra damezirandina partiek wiha di destê mîletekî din de ye. Kurd wê partiyêni xwe çêkin, lê belê, mîletekî din wê destûre bide. Ev jî nîşan dide, gelek aliyen vî kari hene.

Gava Kurdan partiyêni xwe çekirin, gelo ew Kurden ku nuha di nav partiyêni Tirkiyeyê de ne, wê bi ci tehrî hereket bibin? Gelo ev perçebûna Kurdan, wê her zêde bibe an na?

Lê tiştîki din jî heye, di vê demê de ew partiyêni piçûk, di nav jîyanê de, hîn bibin, bêne cem hev û hêdî hêdî hejmara wan kêm bibe, bibin partiyêni xurt û modern. Ev jî ne dûr e.

Careke din dibêjîm, gerek em van hemûyan binivîsin, xeber bîdin, di konferans û civînan de ji hev re bibêjin. Mesele, wê mîna fêkî bigihîje.

Ez berberiya Kurdan li hember hev bas nabînim. Ditîsim ku ev hal têkeve nav wan partiyêni vekirî jî.

Hinek ku heq nadin kesî, kesen derî xwe neheq dibînin, metodîn demokratik bi kar nayîn, lê hîn-kîn din jî her tiştî kêm dibînin, rexne dîkin û bi xwe jî tiştîki na-kin, bi kêmî tiştîki jî nayîn. Ev hemû, wê partiyêni vekirî damezirinî. Lê gerek meriv netirse; yên ku xebatê başnakîn, diji kombûna kesan bisekinîn, ewê di jîyanê de bi qedîn. Qanûna jîyanê wisa ye. Di demen kurt de, dibe ku hinek bi ser kevin, lê jîyan li aliye jîr, xebatkar û yên ku fireh difikirin e.

Berî herkesî, ev mesele girêdayî Kurdan e, lê bi kêmâsi, bi qasî Kurdan girêdayî ew kesen ku Kurd bi wan re dijîn re ye jî.

Lewra di dawî de dibêjîm, ku divê em Kurd wê meselî deynin pêş xwe û bi her alî li ser bifiki-rin.

Stirriyên me

Lawikê Berrivanî

Gewet be ji te re, nivîskaro(!!)

Wê rojê ji nişka ve komputora min kire "tütetüt", işaretet "cardin dizî bû" da min. Cî; rojnama Welat hejmarê 8-9 "nivîskarê" diz; Koyo Berz nîşan dida. Pêşî min got belki programa komputorê tevlihev bûye û alarmeke çewt dide min. Lê wek dibêjin "dereweke xwe bike, şahidekî xwe nîşan bide", komputorê jî "derewa" xwe bi cî û war dikir. Mecbûri, min hejmarê 8 û 9 ên rojnama Welat li ber xwe raxistin û nivîsa Koyo Berz a li ser "Dîroka nivîsandina destana Memê Alan" xwend. Min di cî de ciyê nivîs jê hatibû dizin nas kir. Çimkî ew, beşek ji pêşgotina ku Dr. N. Zaza ji destana Memê Alan re nivîsandiye bû. Lê di rojnama Welat de nivîsê xwedî guherandibû, "nivîskarê" wê içar bûbû Koyo Berz. Min ji xwe re got, gelo nebe ku navekî Dr. N. Zaza yet jî Koyo Berz be? Min ev yet jî havalekî dîrokzan pîrsi. Bersîva hevîl menfî bû, got: "Dr. N. Zaza tu carî navê Koyo Berz wek nasnav li xwe nekîriye." Dû re ez fîr bûm ku "nivîskarê" (!) Meqala destana Memê Alan, Koyo Berzê me yê Swêregî ye. Yanî Koyo Berz beşek ji pêşgotina destana Memê Alan wek meriv kil ji çavan bidize ji Dr. N. Zaza stendiye û kiriye nivîsa xwe.

Ronakbîrê hêja, Dr. N. Zaza ji bo nivîsandina vê pêşgotina 15 rûpelî, wek ew jî dibêje, bi mehan xebitiye, li ser gelek çavkanî û efsaneyen mîtolojik rawestiyaye, di derheqê wan de bîr û bawerîyen xwe gotine, qala gelek Rojhilatnasen Ewrûpî, wek A. Socin, A. Von Le Coq, Oscar Mann, Hugo Makas, Lîska, A. Christensen, Charês de Mitylène û hevd. kiriye; bi kurtayî xebatek ciddî û giranbuha li pê xwe hîştiye. Û Koyo Berz jî bi şikleki bêperwa rabûye li ber çavê hemû Kurdan dest daye ser vê xebata N. Zaza û ew kiriye malê xwe. Qet nehatiye bîrê ku ew bi Elmanî, Ingilîzî û Fransî nizane, gava bi van zimanî nizanibe wê çawa kanibe li ser wan berheman raweste.

Nivîs di du hejmarê rojnama Welat de hate weşandin. Beşê di hejmarâ 8' em (Welat, hejmar 8, 11-17/4/92) de ye, bêyî çend guherandinê biçûk wek orgînala nivîsê weşiyaye. Vî beşî nîv rûpelî rojnamê girtiye. Lê di beşê duyem yê nivîsê de (hejmar 9, 18-24/4/92) bêtir hin tehrîfatêni biçûk kirine. Mesela, N. Zaza gotiye, "Jî ciyayê Dêrsimê heyâ bi Loristanê Memê Alan li her deren Kurdistanê bi nav û deng e." Koyo Berz, di hejmarta bajaran de bêtir comerdî kiriye, navê Diyarbekrê, Mehabadê, Suleymaniye, Qamışloyê û bê guman yê bajarê xwe, Swêreg jî lê zêde kiriye. Di hin ciyan de "piçûk û xort" kiriye "zarok û xort", "kal û jîn" kiriye "pîr û jîn" û hin beşen, ne paragraf kiriye paragraf. Di ciyekî du ciyan de ji bo ku ew jî çend gotinê xwe yêne di cî de û bêmane têxê, çend cumle jî lê zêde kirine. Û bêguman di dawiyê de jî ji bo ku N. Zaza zimanî destana Memê Alan redakte kiriye û Bahozê jî ew weşandiye Koyo Berz sipasî wan dike.

Mumkûn e ku xwendwan ji gotinê min bawer nekin, numûne û delilan ji min bixwazin. A ji were numûne:

"Bingehê wê jî Isa Pêxember pîr wê de ye. Lê avahiyen bê hejmar li ser hatina danîn û gelek reng-reng bûye."

Mewzuyê Memê alan ji Melayî Cizîri jî hîn pîr kevintir e. Li gora dîroknîvisê Danîmarkî yê İrannasê bi nav û deng A. Christensen (Kristensin), destanek wek ya Memê Alan, 1000 sal berî Isa Pêxember di nav gelên Ari de pîr belav bûbû. Nivîskarê Yewnanî bi navê Charês de Mitylène (Şarêsê Mitileni) 500 sal berî miladê çirokeke wisa nivîsandiye.

Diroka qehremanen destanê. Çiroka Memê Alan ji rojhelat hatiye Rojava û hêdî hêdî misilman bûye". (Koyo Berz, Welat, hej 8, rûpel 11)

Ev jî ji pêşgotina kitêba destana Memê Alan:

"Bingehê wê jî Isa Pêxember pîr wê de ye, Lê avahiyen bê hejmar li ser hatina danîn û gelek reng-reng bûye" (Destana Memê Alan, rûpel 11)

"Mewzû'ê Memê Alan ji Melê jî hîn pîr kevintir e. Li gora dîroknîvisê Danîmarkî yê İrannasê bi nav û deng, A. Christensen (Kristensin), destanek wek ya Memê Alan, 1000 sal berî Isa Pêxember di nav milleten Ari de pîr belav bûbû. Nivîsevareki yewnanî, bi navê Charês de Mitylène (Şarêsê Mitileni) 500 sal berî Miladê çirokeke ûsa nivîsandiye." (Destana Memê Alan rûpel 12)

"DİROKA QEHRMANEN DESTANÊ. Me gotibû ev çirok ji Rojhilat hatiye Rojava û hêdî hêdî misilman bûye." (Destana Memê Alan, rûpel 15)

Ji ber tunebûna cî ez nikamî numûnîn zêde bidim. Lema jî ez bi wan numûnîyêñ jorîn qîma xwe tînim.

Dûmahîk: r: 11

Pirsgirêkên şiyarbûna netewî

Di hejmara 126 ya Armancede, bi sernevîsa "Janeke Zirav: Tunebûna Kadroyen Elit" niviseke Rohat derket. Her cend problemen girîng yê civata Kurdistana Bakur weki sewîya bikaranîna zimanê Kurdî, sewîya zanînek hevdem, kembûna materyalen niviskî li ser jiyanâ me ya civakî anîbe ziman jî, nivîs bi tevahî ji aliyê sedemên problem û encamên ku hatine derxistin ve, ji aliyê bikaranîna gotin (terim), ji aliyê naveroka probleman ve, xwedî gelek xeleti û súcdarkirinê bê bingeh e. Ev xeleti û súcdarkirinê ne rast divê zelal bibin ku em bikaribin problemen xwe çareser bikin. Destnîşankirina sede-mên xelet nikare çareyên rast bifârifine.

Mirov nizane ji ku derê dest pê bike, şasî û súcdarkirinê ne-heq ên nivisa Rohat rast bike. Rohat li ser girîngiya "şexsîyet û mirovîn navdar" disekine û dibêje ku ew "di nav civatekê de çiqas zêde bin, rûmeta wê civatê ewqasî bilind dibe". Pişti gelek nimûnen xelet ku ne pêwîst ve mirov bi nav bike, Rohat dibêje ku navê sê Kurdên weki "Ismail Beşikçi, Yalçın Küçük û Doğu Perinçek" ku "bi ramanî, zîhînî, entellektueli ji bo Kurdan xwe seferber dikan... Navê sê kesen Kurd ku di dereca wan de mîjîye xwe bi kar tînin, nikarim bidim, tune". Ev perspektif bingeha nivisa Rohat e. Rohat gazindan ji tunebûna ronakbirêne Kurd dike û pîvanen wî jî Doğu Perinçek û Yalçın Küçük in. Herçend bingeha nivisa Rohat ev be ji, weha xuya ye ku Rohat ji mantiqê xwe zêdetir hestê xwe di vê nivîse de bikar anîye û gelek tişt tevlihev kirine.

Nivîs bi hevoka "Hunermand, nivîskar, zana, pispor, entellektuel û kesen bijarte wek komên elît, kadroyen elît ronahîya çavê netewekî ne... hejmara wan sinor-kirî ye" dest pê dike. Wek tê zanîn pîralibûna (kompleksiya) jiyanâ civakî bi xwe re zanînê û pisporîye di babeten cuda de weki pêwîstî derdixe pêş. Di nivîskarîye de, di dîrokzaniye de, di civaknasîye de û wd. li gor sewîya zanînê hin kes weki pispor têni bi nav kirin. Rohat divê bikariba van tiştan ji hev vejetîne dema ku xwe ji bo destnîşankirina "janeke zirav" ya civata Kurd dike pêş. Berî her tiştî divê term zelal bin, da ku daxwaza mirov jî bê fahmkirin.

Bi pîvanen hevdem, hunermendi yan jî nivîskarî ne elîtbûn e. Lî di nav hunermendant de, nivîskaran de, doktoran de û wd. kesen bijartî ango elît, kesen herî jîhatî û jîr hene. "Elit" ên her civatekê jî li gor sewîya pêşdeçûna wê civatêne.

Seferen kolonyalist li cihane her tim bi "belavkirin û bicihkîrina medenîyetê û pêşketinê" ve hatine ızahkirin. Kolonyalisten Hollandî, Ingiliz, İspanî, Fransî û her wisa Tirk nîren xwe yê li ser kolonîyan bi navê "medenîyetê" parastine. Lî dîrokê, jîyanê pir eskerî dîyar kirîye ku kolonyalist bi riya parçekirina strukturên civakî, bi riya asîmîlasyonâ û.w.d. riya pêşketinê û medenîyetê li ciyat û mirovîn kolonîyan girtine. Di beyana azadî ya Kongreya Neteweyî ya Afrika Başûr de, li ser

Giyayê hewşê malê

Vildan Tanrikulu & Mahmûd Kîper

vê yekê weha tê gotin: "Di ras-tîye de ji bo ji holê rakirina mîra-sa kulturî ya gelê me her tişt tê kirin. Zordaran tenê weki navgîna ji bo domandina paşvemayîn û ce-haletîya gelê me, kulturê bi kar tînin".

Bêguman ev mînakek bi tenê ye ji jiyanâ civakî ya koloniye weki Kurdistanê, ku bêhîvîtî, tirs û xwebîcûkdîtin kirine stûnên jiyanâ civakî ya wan. Ev yek li gelek aliyen dunyayê, di gelek civatan de eßkere xuya ye. Kurdistan û civata Kurd jî ji vê yekê îstîsna-nîne.

Rohat di nivisa xwe de gotineke nivîskarê Frensi Andre Maurois wek nimûne dide: "Tenê êş, jan û eziyet dikarin de-hayan biafirinîn." Ger ev dîti-na Andre Maurois ku welê xuya ye Rohat jî pê re ye, rast be, divê Kurdistan û welatîn wek wê tije "deha" bûna. Ev, mîjî û mantîqa belengaziyê ye. Lî rastî tiştî din e. Hejmara "deha" yan di civakîn pêşketî û serbest û azad de biliñdir e. Sewîya ronakbirîye û pîrbûna "deha" yan gelo bo nimûne li Swêdê yan jî li Tanzania, li Fransayê yan jî li Mozambikê biliñdir e. Bila Rohat bersiva vê yekê bide û bingeha mantîqa belengaziyâ gotina Andre Maurois û ya xwe bibîne! Bi vê perspektifa xwe Rohat iddiayek şasî tîne holê. "Berî çend salan li cîhanê em Kurd bi saya navê Cigerxwîn, Yilmaz Güney, Qanatê Kurdo, serbilind bûn, dihatin naskirin, rûmeta Kurdan taybet li Ewrûpa zêdetir bû". Rast e em Kurd bi van navan serbilind bûn, iro jî serbilind in. Lî iddiaya ku Kurd bi saya navê wan dihatin naskirin ne rast e. Gelo çend ber-hemên wan bi zimanê Ewrûpiyan hatine belavkirin? Gelo çend ber-hemên wan ji aliyê 'cîhanê' ve hatine xwendin ku cihan Kurdan "bi saya navê wan" nas bike? (Yilmaz Güney bi filîmê xwe yê YOL îstîsna ye)

Pirtûkên Ismail Beşikçi taybeti jî ya bi navê "İlim, İdeolojiya Resmî, Dewlet, Demokrasî û Pîrsa Kurd" û her wisa jiyanâ wî weki akademîsyenek benden li pêşîya ronakbirêne Kurd gelek eskerî diyar dike. Rohat bêyî ku rastîya welatê xwe, bingehê lêkolînan, xebatêne akademîk-ilmi bide ber çavê xwe, dest bi gazindan dike û ji tunebûna "kadroyen elît" (di kîjan warî de ew jî ne dîyar e!) him ronakbirêne Kurd ku di nav têkoşîna siyasi ya neteweyî de bi perspektivek sosyalist cih girtine û him jî sistema sosyalist súcdar dike. Li vê derê mirov nikare xwe bigre ku ji Rohat bipirse, gelo Doğu Perinçek û Yalçın Küçük hindik li ser "pîrsen dînyayê dilşewati nîşan didan" û didin jî. Kesen xwenda û yê ku bala xwe didin pîrsen civakî, gelek baş pê haydar in ku D. Perinçek yek ji wan ideologen herî pêşin ên Maoizma li Tirkîye ji salen dawîya 1960'ı vir de ye û Y. Küçük jî yek ji wan siyasetvan û

akademîsyenên herî grîng e ku li ser pîrsen sosyalizmê û Sovyet "xwe diêşandin" diêşinin. Her wisa li ser pîrsen siyasa û civakî yê Tirkîye jî bîr û rayê xwe, alternatifîn xwe wekî muxalefet tînin ziman. Ev tişt in ku wan dikin "ronakbîr". Ne bi tenê li ser pirsgirêkên civata xwe, her wisa li ser pîrsen giştî yê mirovatiyê mijûl bûn jî pîvanekî grîng yê ronakbirîye ye. Ev pîvan çawa ji bo Doğu Perinçek û Yalçın Küçük rast be, ji bo bi hezaran ronakbirêne Kurd, wek Orhan Kotan, Murad Ciwan, Mehmet Emin Bozarslan, Kemal Burkay û Malmisanij jî rast e ku çend ji wan in û navê wan nayen bîra Rohat. Mînakîn Rohat bi xwe iddiayen wî yê li ser ronakbirêne Kurd, ku ew bi xwe jî yek ji wan e, pûc dike.

Rohat di nivisa xwe de iddiayen dike ku ".di navbera salen 1970-1980'yan de bi hezaran entellektuelen Kurd enerjîya xwe ya ruhi, ramanî, di babeten mayîn de bi kar anîn. Janên gelê Kurd biçuk dîtin..." Rohat bi vê iddiayen neheşîyeke mezîn hem li xwe hem jî li entellektuelen Kurd dike. Ew ji bîr dike ku ronakbirîye wî bi xwe jî encama xebata yek ji wan hézan e ku bawerî bi sosyalizmê anîbûn. Wê deme Doğu Perinçek wek ideolojekî navdar yê Maoizma li Tirkîye û Yalçın Küçük jî wek yek ji ideologen Partiya Karker a Tirkîye (TİP), kapasîteya xwe ya ruhi û ramanî ji bo súcdarkirina ronakbîr û siyasetvanen welatparêz yê Kurd ku têkoşîna avakirina strukturên netewî yê civaka Kurd li Bakurê Kurdistanê, didan, bi kar dianîn. Doğu Perinçek tevgera neteweyî ya gelê Kurd li bakûrê Kurdistanê bi tevahî weki "seperatist" bi nav dikir. Di parastina xwe ya di dadgehîn eskerî di doza "TIKP" de "serbilindiya" xwe ji bo têkoşîna li hember hêzen ku dixwestin Tirkîye parve bikin dianî ziman. Her wisa Yalçın Küçük dema kadroyen, sosyalist ên Kurd bi şîara Kurdistanek serbixwe û bi avakirina hêz û partîyen cuda mijûl dibûn û pîrsa neteweyî ya Kurd li Tirkîye bi her aliyê xwe ve munaqeşe dikirin, Yalçın Küçük û hevalen xwe li ser navê sosyalizmê ew bi "Bund" çitiyî itham dikirin. Yalçın Küçük bi navê "Türkiye Üzerine Tezler" û "Aydin Üzerine Tezler" deh cild (ji 5000 rûpeli zêdetir) pirtûk nivisine. Di nav van pirtûkan de mirov nikare lêkolînan yekser bi civata Kurd û pîrsa neteweyî ve girêdayî be bibîne. Pirtûka wî ya bi navê "Kürtler Üzerine Tezler" jî ji parastinê wî yê di dagdehan de pêk tê û li wir jî tu tiştîn ku ji bo ronakbirêne Kurd nû bin, mirov peyda na. Yalçın Küçük heta destpêka 1989 an jî bi iddiaya "kürtçitî" nehatiye ithamkirin. Lî dema ku mirov iddaanameya DDKO û parastina ronakbirêne Kurd di destpêka salen

bi dijwarî dide pêjandin."

Ne wek Rohat dibêje, lê "te-qîna weşanên Kurdî" ya van salen dawîyê encamek ji xebatêne bi israr yê ronakbirêne Kurd e, di riya rizgariya neteweyî û demokratik de.. Encamek ji wê perspektîva avakirina civatek bi strukturên xwe yê civakî, siyasi, kulturî ûwd. e. U her wisa ev yek ji ber xwe ve dernekeye holê, bi giranî berhemên ronakbirêne Kurd yê ku Rohat weki "nîşêke wendabûyi" bi nav dike ye. Eger Rohat li dor û bera xwe binê, wê bibîne ku ew nîş winda nebûye. Ma kesen ku fro di warê kulturî di dixebitin bi piranî kî ne? Eşkere ye ku divê rola atmosfera siyasi û mecala xebatêne demokratik ya li Tirkîye jî neyê inkarkirin. Rohat nikare bi qasî Ugur Mumcu jî vê rastiyê bibîne. Ugur Mumcu ku mirov nikare weki dostê Kurdan bi nav bike, dikare vê rastiyê tesbit bike. Di pêşgotina kitêba xwe ya bi navê Kurt-İslam Ayaklanması (Serhildana Kurdi-İslamî), 1919-1925'a de wanî dibêje: "Bi hezaran bend li pêşîya lêkolînen li ser pîrsa Kurdi hene. Yek ji wan bendan ne eßkerebûna belge û qeydîn fermî ne... Her wisa di diroka me ya nîzîk de pîrsa Kurdi di nav çerçeweyen qedexeyan de maye. Di babeta Kurd de van qedexeyan pêşî li ronikirina vê babetê û pîşî girtiye". (r: 7).

Bêguman Ismail Beşikçi ji wan her du ronakbirêne Tirk ku Rohat bi nav dike, cudatir e. Di dawîya salen 1960'ı de ew wek asistan li Üniversiteye Erzurumê, lêkolînen li ser civata Kurd dike hîmî xebatêne xwe yê akademîk. Bi vê xebata xwe, wî bi serbilindî cihê xwe di dilê gelê Kurd de gitîye. Lî dema ku van salen dawî Ismail Beşikçi ji akademîsyenekî zêdetir wek siyasetvanek terciha xwe ya siyasi di nav hêzen Kurd de kiribe, yan jî bîr û rayen xelet dabe pêş xwe, bêguman mafê her kesê ku ji wê xeta siyasi cuda di-fikirin, heye ku rexneyen xwe bînîn ziman. Rexne dikarin "sivik", yan jî "giran" bin, lê ev ne "sosret" e yan jî "rûreskîn" e. Welê xuya ye ku Rohat dixwaze her kes ji her tiştî re li cepikan xe. Ev pisikolojîya belengaziyê ye. Ismail Beşikçi bi xwe buhayekî mezin dide perspektifeke rexnegir û vê yekê wek bingehê ber-pîrsîyariya ronakbirî û zanîna ilmî dibîne.

Dibe ku ronakbirêne Kurd gelek şasî jî kiribin. **Lê li Bakurê Kurdistanê peydabûn û pêş-keftina hest û huwiyyeta me ya neteweyî, hebûna me ya neteweyî yekser bi têkoşîn û fedakarîya ronakbirêne Kurd ve girêdayî ye.** Bê gu-man ronakbirêne sosyalist ên Kurd ji di vî warî de xwedî rol û cihekî girîng bûn û iro jî weha ye. Ev berpîrsîyari berî her tiştî bi avakirina strukturên Kurdistanî yê serbixwe ve derkefiye holê. Bi tenê munaqeşeyen li ser "partî/partîyên Kurd" û helwêstên Doğu Perinçek û Yalçın Küçük di vî warî de minakîn eskerne.

Dema ku em Kurd bikaribin siyaneta xebatêne hevdu bigrin, ji kompleksa xwe biçûkdîtinê bi dûr kevin, em dê baştîr bikaribin ras-tiye xwe bibînîn û xwe ji súcdarkirinê bêbingeh dûr bixin.

QANÛNA HILBIJARTINA MECLISA NETEWî YA KURDI

Sedem

Kirinên nedîfî yên hukûmetâ İraqê; bi bîryarekê vekîşandina memur û karmendên idarî ji Kurdistanê, li herê mî hem valahîya hukûmetê û ya qanûnan peyda kir, hem ji Cebheya Kurdistanâ İraqê ya ku bi hukûmetê re guftûgo dîkirin, rû bi rûyi rewseke alob û berpirsiyariyeke giran hişt.

Di cîvakekê de kar birxistin, dest-hilatdanya qanûn û adaletê bîchanîn, peydakîra xwârin û dermanan, ew-lehi û serdestiya huquqê, parastina matî mulkiyêt, parastina maf û azadi û jîyan û rûmîta hevwelatiyan bi xebata takekesan naçe seri, karekî weha xebateke besdar pêwîst dike û ev ji bî riya nûneren gel mumkun e.

Jî mîj ve ye diroka insaniyete demokrasi wek metoda ku bi daxwaz û bi riya nûneren xwe, halina ser hukum ya gel, qebûl kiriye. Demokrasi bi berxwedana xwe ya di jîyanan insaniyete de bûye riya ku cihana fro li ser dimeşe û bi vi awayî rî li ber metodên din girtine. Cihanê édi derî li sistema diktatoriyê girtiye û berê xwe daye sistema nû ya dînyayê ku li ser bingehê siyaneta ji bo demokrasi û maf û azadiyên insanî bilind dibe.

Cebheya Kurdistanâ İraqê iro rexistina meşru ya Kurdistanê ye û lewra ji bîryar daye ku xwe bide ber vê berpirsiyariye giran û rewşa alob ya ku hukûmetê ew rû bi rû hiştîye. Cebheye ji bona ku Kurd ji li bî cîvakan hevdem yên dînyayê cihê xwe bigrin, li gor realiteya çerxa me û rastiya jiyanâ li Kurdistanâ İraqê, gava yekem avêtiye.

Bî vi awayî cîvaka Kurd ji vê, li gor çarçewa peymanen navnetewi, bide xuya kirin ku xwe bi xwe dikare cîvaka xwe idare bike û cîvakekê li ser hîmî siyaneta ji bo demokrasi, maf û azadiyên insanî ava bike.

Hin di sala 1988'an de Cebheya Kurdistanâ İraqê bîryara dârîna Meclisa Netewî girtibû. Ji ber ku bi tenê mecliseke weha dikarîbî temsila baweriya gel bike. Lî ji ber bûyerên hîngê û di sala 1991'an de ji pişî serhîdana mezîn, ji ber bûyerên ku li peyhev û bi lez rû dan, bi taybetî ji ji ber koça dirok û guftûgoyen bi hukûmetê re, cebhê nekarîbî bîryara xwe bi cihbine.

Di guftûgoyan de heta iro tîstek bi tenê ji nehat bi dest xistin. Hukûmetâ İraqê bere-bere ji sozên xwe vegeriya û bi ser de ji cî di warê eskerî û mali, cî di warê idarî û psikolojik de be, zordarî da ber xwe. Bi vê zordarî ji pîvanen herî besit yên insaniyete ku cihana hevdem li wan xwedî derdikeve, xistin bin lingan.

Demokrasi li gor prensipâ jihevvedetandîna kareñ wek qanûndanîn, bîrêvebirin, muhakemeyê, idareya gel ya bi destê nûneren wî ye. Li ser bingehê vê prensipê, Cebheya Kurdistanâ İraqê ji ber dagirtina valahîya di warê idarê de, bîrêvebirina karûbaran û meşandina danûstandanîn di gel hukûmetâ merkezi bi tenê dikare bi riya idareyeke ku bi hilbijartînê rasterast û azad peyda bûyi, bi cihben, ev qanûn derxistîye.

Serokatiya Politik ya Cebheya Kurdistanê 8' ê Nisanê, 1992.

Biryar nr :1

Ji bo berjewendiyen gelê Kurdistanâ İraqê, serokatiya politik ya Cebheya Kurdistanâ İraqê qanûna li jîr derxistîye.

NR: 1-1992

Meclisa Netewî ya Kurdistanâ İraqê:**BEŞA YEKEM****Pêkhatina Meclisê**

Bend 1: Meclisa Netewî ya Kurdistanâ İraqê ji bo her 30.000 kesar nûnerek, lewra ji asgari ji 100 endaman pêk tê.

Bend 2: Hilbijartîn bi dengdana giştî û veştarî tê kirin.

Bend 3: Endamê/a meclisê nûneriya gelê Kurdistanâ İraqê dike.

a- Ji ber ku endametiya meclisê û karekî din ê dewletê bi hev re nabin, pişî sonda li pêş meclisê, memur wek istifakîrî tê hesibandin.

b- Kesê ku bi riya hilbijartîn bûye endamê/a meclisê, nikare bibe endamê/a mecliseke din.

c- Serokên karêni idarî û efserên hêzên ewlehiya navxwe berê istîfa nekin, nikarin ji bo endametiya meclisê xwe wek namzett pêşkêş bikin.

d- Di berdewamiya endametiya meclisê de endamek nikare direktan û indirek û bi riya peymanan bi dewletê re kar bike, yan endametiya xwe ya meclisê ji bo berjewendiyen xwe yên taybetî bi kar bîne.

Bend 5: Tev endamên meclisê profesyonel in.

BEŞA DUYEM**Hilbijartîna Meclisê:****BIRÊ YEKEM****Mercen Hilbijartînê:**

Bend 6: Bi bîryara Cebheya Kurdistanâ, ji bo hilbijartînê li Kurdistanâ İraqê Komîteya Bilind a Hilbijartînê tê danin. Ev komîte bi serokatiya dadgerekî ji mehkemeya herî bilind, ji mehkemeya istînaf, ji sawciyek, ji cîgîrê sawciyek, ji nûneren Cebheya Kurdistanâ û ji nûnerekî idarî pêk tê û bi wezîfeyen li jîr radibe:

a- Destnîşankirina herêmîn hilbijartînê

b- Ji bo çêbûn û rekûpêkiya hilbijartînê herêmîn, Komîteyên Herêmîn yîn Hilbijartînê pêk tîne.

c- Awa û tarîxa hilbijartînê dest nûşan dike, ji bo hêşankirina hilbijartînan telîmatan diweşîne, serok û endamên komîteyên hilbijartînê pêşniyar dike.

Bend 7: Komîteyên herêmîn yîn hilbijartînê bi serokatiya dadgerekî, ji nûneren idarî û ji yîn cebhê pêk tê û komîteyên deverî yîn hilbijartînê datinîn.

Bend 8: Komîteyên deverî yîn hilbijartînê bi serokatiya dadgerek, yan cîgîrê sawcî, yan huquqnasekî ji nûneren listeyen ku besdarî hilbijartînê dibin, pêk tê.

BIRÊ DUYEM**Herêmîn Hilbijartînê**

Bend 9: Kurdistanâ İraqê herî kêm bo 4 herêmîn hilbijartînê tê beş kirin.

Bend 10: Herêma hilbijartînê bi destnîşankirina komîte herêmîn ya hilbijartînê bo çend merkezen hilbijartînê tê beş kirin.

Bend 11: Li gor vê qanûnê, li herêmîn ku nuha hilbijartîn lê çekirin ne mumkun e (di bin kontrola hukûmete de ne), paşê dema ku rewş dest dide wê hilbijartîn çêbibin.

BIRÊ SIYEM**Tarîxa Hilbijartînê:**

Bend 12: Bi bîryara Cebheya, hevwelati herî kêm mehek berê bi riya weşanen ji tarîxa hilbijartînê tê

agahdar kirin.

Bend 13: Li her derê Kurdistanâ İraqê di eyîn rojê de dengdan bi cih tê.

Bend 14: Di rewşa bidawîhatina dema wezîfa meclisê, yan fesikhîrîna wê de, ji aliye serokê/organâ birêv-ebirîn ve di 15 rojan de tarîxa hilbijartîna meclisa nû li gor benda 12 ya vê qanûnê tê dest nişan kirin.

BIRÊ ÇAREM**Listeyen Hilbijeran**

Bend 15: Listeyen hilbijeran her herêmîke hilbijartîn li gor réza alfabetik bi nav, meslek, adres, cih û tarîxa jidayîkbûna hilbijeran bo komîteyên herêmî yîn hilbijartînê û bo merkezen hilbijartînê tê şandin. Di peydabûna tevhîveyekê de Komîteya Bilind a Hilbijartînê rî û awayen müasib dest nişan dike.

Bend 16: Ji bona agahdarkirina hevwelatiyan, komîteyên herêmî yîn hilbijartînê berî tarîxa dengdanê bi 15 rojan listeyen hilbijeran yîn bi mora Komîteya Herêmî a Hilbijartînê morkirî û tarîxa ilankirinê destnîşankirî li gor benda 15 ji bo merkezen hilbijartînê disîne.

Bend 17: Idareya nufûsê, kartên hilbijeran yîn ku ji aliye Komîteya Bilind a Hilbijartînê ve hatine amade kirin, li hemû hevwelatiyan ku 18 saliya xwe qedandine, belav dike. Li cihê dengdanê wek belgeya huwiyyeta xwe hilbijer mecbûr e vê kartê nîşa bide.

Bend 18: a- Her hevwelatiyekî, ku 18 saliya xwe qedandî, eger navê wî/wê di listeyen ilankirî ya hilbijeran de nabe, maf heye ku di nav deh rojân pişî ilankirina listeyen de muraceat bike û navê xwe bide nîşandin, her weha dikare daxwaza nîşandin, yan jîbirina (bi sedemîn di cihen xwe de) navên kesen din bike.

b- Daxwazeke weha ji komîte Herêmî a Hilbijartînê tê kirin, Komîte Herêmî a Hilbijartînê di 3 rojan de bersivê dide. Bîryara Komîte Herêmî ya Hilbijartînê bîryara dawî ye.

BIRÊ PENCEM**Mercen Hilbijartînê û Hatinhilbijartînê**

Bend 19: Her hevwelatiyek Kurdistanâ İraqê û qedandina 18 saliyê mercen hilbijerîtye ne.

Bend 21: Ji bona ku mirov bikare xwe ji bo endametiya meclisê bike namzett:

a- Divê mirov hevwelatiyê/a Kurdistanâ İraqê be û li wir bijî.

b- Divê mirov 30 saliya xwe qedandibe û aqîlê wî/wê li cih be.

c- Divê mirov bikaribe bixwîne û bînîse.

d- Divê mirov ji ber súceke li dijî exlaqê civakî hukum nexwaribe.

e- Divê mirov ji ber súcén kuştin, xesb, yan diziyê hukum nexwaribe.

f- Divê mirov besdariya súcén ku bi destê rejîma zordar hatine plankinî û Kurdistana bîchanîn, nekîriben.

BIRÊ ŞESEM**Namzett**

Bend 22: a- Her partî, tebeqe û kîmereteweyen (Turkman, Ereb, Asûrî u.w.d.) di nav sînorê Kurdistanâ İraqê de, maf hene ku listeyen bi navên namzettan xwe pêşkêş bikin.

b- Divê listeyen namzettan di nav 10 rojîn pişî ilana tarîxa hilbijartînê de di gel belgeyên di benda 21 em a vê qanûnê de diyarkirî, pêşkêşî serokê

/a Komîte Bilind a Hilbijartînê bibin.

Bend 23: a- Komîte Bilind a Hilbijartînê di nav 24 saetan de bîryaré li ser muraceatê dide û di nav du rojan de ji namzett û nûnerê/a listê ji bîryaré tê agahdar kirin.

b- Pişî agahdariya bîryaré, di nav du rojan de maf heye ku li ba Dadgeha Bilind a Kurdistanâ İtirazi bîryara Komîte Bilind a Hilbijartînê bê kirin.

c- Dadgeha Bilind di nav du rojan de bîryaré li ser itirazê dide. Bîryara dagehê bîryara dawî ye.

d- Roja ku bîryar li lewheya agahdariyê tê daleqandin, aliyeleqedar ji bîryaran agahdar tê hesibandin.

e- Komîte Bilind a Hilbijartînê herî kêm 12 roj beri hilbijartînê listeyen namzettan bi riya çapemeni û weşanen belav dike, li merkezen xuyakirî dadi-leqine.

BIRÊ HEFTEM**Propaganda Hilbijartînê**

Bend 24: Propaganda hilbijartînê di nav çerçewa qanûn, nîzama pişî û qeydeyîn exlaqî de, azad e. Cebhe di navbera listeyen raqîb de wekheviya imkanan diparêze.

Bend 25: Propaganda hilbijartînê roja pişî ilana listeyen namzettan dest pê dike, û beri roja dengdanê bi 48 saetan bi dawî tê.

BIRÊ HEŞTEM**Dengdan**

Bend 26: Serok û endamên merkezen dengdanê li pêş Komîte Herêmî a Hilbijartînê, dadger û sawciyan sonda li jîr dixwin:

" Bi navê Xwediyê mezin sond diwîm ku ez ê wezîfa xwe bêlî, jîdîl û adilane bi cih bînim."

Bend 27: Komîte Bilind a Hilbijartînê awa û hejmara sindoqan û şiklê vekirin û girtina wan dest nişan dike, telîmatan dike.

Bend 28: Komîte Herêmî ya Hilbijartînê li gor telîmatan Komîte Bilind a Hilbijartînê pusula û sindoqan hilbijartînê amade dike.

Bend 29: a- Dengdan wê li ser pulsuya ku ji aliye Komîte Bilind a Hilbijartînê ve hatiye dest nişan kirin, bi nîşandina listeyen ku tê xwestin, bi cih bê.

b- Kesekî din dikare ji bo nîşandina alîkarya hilbijerîn nexwenda bike.

c- Wakaletiye dengdanê nayê qebûl kirin.

Bend 30: Nîzama li merkeza dengdanê karê serokê/a merkeza dengdanê ye. Ew ji bo serûberî û ewlehiya dengdanê dikare tedbirîn pêwîst bigre. Hêzên Ewlehiya Navxwe û kesen çekdar nikarin têkevin hundîre merkeza dengdanê, lê, li ser daxwaza serokê/a merkeza dengdanê ew dikarin têkevin.

Bend 31: Komîteya Sindoqan ji bo her giliyekî girteyeke cihê dinivisîn.

Bend 32: Dengdan saet 8'ê sîbê dest pê dike, saet 20'ê şevê bi dawî tê. Komîte Bilind a Hilbijartînê bêyî ku dema ji bo dengdanê hatiye tirxan kirin, îhlal bike, selehiyat heye ku saetin cihê ilan bike.

Bend 33: Bidawîhatina dema dengdanê re, serokê/a komîte sindoqê ilan dike ku dengdan bi dawî hatiye û gitre dinivisî. Sindog t

TANA IRAQÊ

meclisê mabe.

BEŞA ÇAREM

Awayê Karûbarên Meclisê

Bend 45: Meclis li Erbilê dicive. Eger pêwîst be dikare li cihêki din jî biceve.

Bend 46: Civîna yekem a meclisê roja 10'ê ya pişti flânkirina encamên hilbijartine, saet 10.00 an de çedibe.

Bend 47: Yekemîn celseya meclisê di bin serokatiya pîrtîrîn endam de çedibe û endam sonda li jî dixwin:

"Bi navê Xwedâyê mezin sond di-xwim ku ez ê yekitiya erd û gel û ber-jewendiyen bilind ên Kurdistanâ Iraqê biparêzim."

Bend 48: Meclis di celseya pêşin de ji xwe re bi dengdana veşartî û bi dengenê piraniya mutleq ên endaman serok, cîgirê/a serok û sekreterekî/hildibijêre.

Bend 49: a- Di yekem celseya xwe de meclis tarîxa celseyan bê dest nîşan dike ku nabe ku hejmara celseyan salê ji duduyan kêmîtir be.

b- Serokê/a meclisê, yan jî ji 1/4 endaman dikarin meclisê gazi civîna awarte bikin. Di vê rewşê de rojeva plana kar a meclisê ji bendênu meclis ji bo civîyaye, pêk tê.

c- Li ser daxwaza serokê/a organa birêvebirinê, serokê/a meclisê dikare meclisê gazi civîna awarte bike.

Bend 50: Gava piraniya endamên meclisê ne amade be, ne durust eku meclis biceve. Biryar bi dengenê piraniya mutleq têngirtin. Ev yek jî bili rewşen ku piraniyeke taybeti pêwîst dike, derbas dibe. Eger deng qasî hev derkevin, mafê dengê tercîh ê serok heye.

Bend 51: Dema wezîfeya meclisê 3 sal e û ev dem ji celseya pêşî dest pê dike û di celseya dawi ya sala siyem de bi dawî tê.

Bend 52: Celseyan meclisê ji her kesî rê vekirî ne. Lê eger serok, yan ji 1/4 endam daxwaz bikin û piraniya endamên amade ji erê bikin, celse dikarin veşartî bin.

Bend 53: Organâ birêvebirinê ku ji meclisê cihê ye û 10 endamên meclisê dikarin muswedeyen qanûna pêşkêş bikin. Lê heta ku muswedeyâ qanûnê ji komisyonâ eleqedar derbas nebe, li ser munaqeşey nayê kirin. Muswedeyâ ku hatiye red kirin, di eyñî sala qanûndanînê de nikare car din bê pêşkêş kirin.

Bend 54: a- Li gor destûra navxwe, her endameki/e meclisê maf heye ku pirsepşeniyaran di derheqê emdamên organa rêvebirinê de bidin. Divê bersiva tev pêşniyaran di 7 rojan de bênen dayin. Tev munaqeşe li pêş endamên medlisê tê kirin.

b- Mafê bi kêmâni 10 endamên meclisê heye ku di derheqê organa birêvebirinê de pêşniyara bêbawerîyê bîdin. Munaqeşeyâ vê pişti 7 rojan t, kirin. Dengdana bawerîyê ji bi du rojan pişti munaqeşeyê tê kirin.

c- Eger meclis bawerîyê xwe ji organa birêvebirinê, yan ji serokê/a wê bikşîne, divê organa birêvebirinê yekser istifa xwe pêşkêş bike.

Bend 55: Serok yan cîgirê/a serokê/a meclisê serûberiya medlisê bi cihîne.

BEŞA PÊNCEM

Selehiyat û Wezîfeyen Meclisê

Bend 56: a-Qanûnan derdixe.

b- Li ser pirsgirêk û hevgirînê gelê Kurdistanâ Iraqê bîryaran dide, pêwendiyen qanûnî yêndi gel hukûmeta merkezi dest nîşan dike.

c- Meclis, serokê/a organa birêve-

birinê yê/ya ku selehiyat heye ku ci ji nav meclisê, ci ji derveyî meclisê endamên organa birêvebirinê dest nîşan bike, hildibijêre.

d- Bawerîya xwe pêşkêşî organa birêvebirinê dike, yan bawerîya xwe jê dikişine.

e- Butçeya giştî û planen pêşveçünê dest nîşan dike.

f- Karûbarên organa birêvebirinê kontrol dike.

g- Destûra Navxwe ya Meclisê çedike, hebûna mulkiyetê dest nîşan dike, li ser butçeya xwe biryar digre û memurên xwe tayîn dike.

h- Li gor destûra navxwe komisyonen daîmî û yêne muweqet dâdimizirine.

i- Ji bo mehkemekirina emdamen ku ji sonda xwe vegeyane, qeydeyên gunehbarkirinê datîne.

j- Endamê/a ku li ser hilbijartina wî/wê şâibe hene, bi piraniya 2/3 dengan ji endametiye derdixe.

BEŞA ŞESEM

Sûcén Hilbijartînê

Bend 57: Sûcén li jîr bi hebis têne kezîn:

a- Ji hilbijeran re pere tekli kirin, şantaj, yan bi hêz bikaraninê ji bo qezencenkirin, yan qezencenkirin yekî/hexbitin.

b- Dizî, xesb, yan windakirina sindoq, yan pusulayen hilbijartînê. Di rewşeye weha de li hember kesê ku li dij van karan rawestayi sücek kirin.

c- Bi zanîn navê xwe ji carekê zêdetir di listeyen hilbijeran de nivîsandin.

d- Ji carekê zêdetir deng dan.

e- Listeyen ji bili naveroka listeya heqînî nivîsandin.

f- Bi ci rî be, bila bibe, nehiştina bikaranîna dangan.

g- Rê li ber denggirtinê, yan serûberiya wê girtin.

h- İhlalkirina qanûna propagandaya hilbijartînê

BEŞA HEFTEM

Bendên Cihê

Bend 58: Tu kes, yan hêzên çekdar, bêyî daxwaza serokê/a meclisê nikare têkeve hundîrî meclisê, yan nêzî wê iqamet bike.

Bend 59: Di nav sê mehîn pişti hilbijartînê de daxwaza hilbijartina nûnaye kirin.

Bend 60: Qanûnên ku meclisê derxistine, di rojnameya taybeti ya meclisê de têne weşandin. Eger tarîxek nehatibe dest nîşan kirin, qanûn ji roja ku tê weşandin, derbas dibe.

Bend 61: Ev qanûn ji roja di rojnameya Cebheyê de tê weşandin, derbas dibe.

8'ê Nîsana 1992
19'ê Newroza 2692

Serokatiya Politik ya
Cebheya Kurdistanê

Celal Talabanî- Yekitiya
Nîstimanî Kurdistan

Mesûd Barzanî- Partiya
Demokrat a Kurdistanê

Abdullah Agirin- Partiya
Demokratik a Serxwebûna
Kurdistanê

Resûl Mamend- Partiya
Sosyalist a Kurdistanê

Eziz Muhemmed- Partiya
Komunist a Iraqê

Sami Ebdurahman- Partiya
Demokratik a gelê Kurdistanê

Gadir Eziz- Partiya Zahmetkêşen Kurdistanê

Yaqûb Yûsif- Tevgera Demokratik a Asûri

Wergera ji Tirki: S. Rêving

Gerrek dîrokî li nav arşîvan

Hêsîrên Kurd li Rûsyayê

Destpêka wê di hejmara berê de

Cend cara qewimiye, gava Kurdan li sükê ji bo xwe sêv dikirin, di vegere de li ser riya xwe bêyi ku ew sêv tem bikin, li feqîran belav dikirin. Carekê ez li mala xwe bi yekî Kurd re rûniştibûm, kesîbek nêzîkî me bû û pars ji min xwest. Min riya metbexê nîşanî wî da û jê re got: "Here wir, wê te têr kin". Yê Kurd bi awakî matmayî li min nîhîrî û pîrsî: "Li cem te diravê hene?" Û li ser bersîva min ku diravê hûr tunene, ewî bi lez destê xwe avêt kîsikê xwe diravek jê derxist, dirêjî min kir û bi dîzî da min, ji bo ku yê parsek nebîne û got: "Ha, bidê". Paşê bi min re şirove kir ku vaga yek parsek dike, meriv gere xêrê bi destê xwe bide wî, ne ku bîşîne cem hinekan. Dibe ku ew jî re bêjin na.

Cend caran min bi çavên xwe dîtiye, çawa Kurd li ser kûçê pîreka ku av dibir, ew disekinand, satil ji destê wê digirt û heta malê dibir û di ber xizmeta xwe da tiştek nedixwest.

Havînê bi hatina wexta xebata li nav zevîyan, Kurd diçûn paleyiye û pere derdixistin, Paşê gava yêne me dîtin, ku ew ji palen me bêtir kedê dikin, (yekî berenberî sisiyan kar dikir) qîmetê karê wan ducarî zêde kirin.

Edî, pişti wexteke kurt, Kurdan kurtikên nûn yên ser û bîllîqoki, bi sim neqîsandî û bi têlén zêrîn derzîkirî li xwe kirin. Fêşen (kumên) bi gotikên hevirmiye yên şin li serê xwe kirin. Daviya havînê kîncen wan idî bi awakî giştî rîkûpêk bûn. Bi diravê qazancîkirî ji xwe ra parce û qumas dikirin. Bi destê xwe dibirin, hîrvîz dikirin. Gere bêjîm, ku wan tiş bi hostatî û bi şureta mezin dikirin. Di nava salê da çend cara min dîna xwe dida wan, Kurd bi hevra geleki bi aşti û xéraxîzî derbas dikin. Xeyda mezin ji rojekê zêdetir nedikîsand. Ew dibêjin, gerek xeyd zêdeyi rojekê nebe, gune ye, "çav dirjin". Bi gîlikî din di nav Kurda da comerdiya patîrxa li gelek e. Çêtir û pîvâna vê rastîya li ser Kurdan, nîrîn rûnişteyen Roslavlê ne, yên ku bi bûyerên vê salê ku li bajêr qewimi bûn girêdayîye i dema agir bi bajare wan ketibû û di nava sê seheta de sê parê bajêr bû xurê alava agir.

Qijejîa germê, berî ku agir pê keve û bagera neditî tev li agir, ku hêlepîtkê agir gur dikirin, ne ji taqate merivan bû, ku rî li ber şipûkê bigire. Ci diket ber agir di çend deqan de dibû xuî. Dema sawê girtibû ser hemûyan, Kurd bi bêtirsîya xwe ya neditî, nehewşandin û çelengîya xwe dîyar kirin. Bi bahanga hildikiyane ser banê xaniyan, betanî, kulav û tiştên mayîn ên şîl radixistin, bi vê alîkariye gelek xanî ji agir parastin. Gava agir kumîk dêrê girt, Kurdan pêlavên xwe êxistin, serpêcê serê xwe danîn û bi heybet ketine hundur, bi hurmetek mezin hûrmûrê dêrê jê der anîn, danîn ser ciyê bêqezya.

Kirina wan tesireke kür li ser hemû bajarvana hişt. Qedir û siyaneta wan ji paqîjiya xeysetê wan û ji ber ku ew li Feyde nedigeriyan, dilvekiri bûn, ji alîyê hemû kesan, yên ku karin merdiya dijminê xwe qîmet kin, li hemberî wan şekirdarî diyar bû. Hêja ye ku li pêş temamya dîn em merdiya Kurdên şûndamayî yên patriarxa bereweri merdiya Ingilîzên xwendewar û pêşketî bikin. Gelo pişti vê yekê ji meridet û kûraya fikirdarya Ingilîzân û ji xisletên, ku ew xwe pê mezin dikin,

çî dimîne? Jîyanê da xuyakirin, ku medeniyeta Ingiltere her tenê xoreshîrestî yê, fêdegeri yê, nevsgiraniye, kubarya vale, zulmdariye û serxewbûnê xuliqandiye. Ü vê jîyanâ bajarvaniye ya xwe ew dixwazin bi darê zorê bixin stuyê Rûsyayê. Werin em destê xwe deynin ser wîjdanê xwe, gelo, em dikarin bêjin, ku Ingлиз ji Kurdan paqîjîr û merdit in? Helbet, na, iro roava medeniyeta pepûk ber bi zêrîzemin axirabiyê tol dike.

De bira ev kirêti ji Rûsyâ pîroz bibhure.

K. MİKËŞÎN

S. Pêtêrbûrg, 8-ê Çîrya Pêşin.
"Sêvîrnaya pçela", s.1855, N283,
rû27-31.

Dokümênt 2: (Nêrîna pênc akademik-zanyarê Rûsyayê li ser pêşvabirina Kurdnasiyê û hêjatiya çûyîna Kurdnas P. Lêxa nav hêsîren Kurdan li Roslavlê)

Di nava van dehsalên dawiyê de Akademiya Zanyariye yek ji armancen xwe yî xisûsi, lêkolînê li ser gelén, ku di katê xwe da û niha li ser erda Rûsyâ iroyin dijin, dihesibîne. Ew lêkolîn li ser gelén ne ku tenê li ser axa Rûsyayê ya parça Evropayê, her wiha li Sibirê û li ser axa Qavqazî jîyane, bi destê endemên akademiyê li kar e û bi spartina akademiyê, bi destê kesen ne endam pêk anîye. Di nav rîza gelén Qavqazî da Kurd ji cîyê xwe digrin. Eşîren Kurdan yên pîrjîmar ji axa Qavqazî dîghîjin heta Şamî û delavê/xelicê/Farisa. Jimara Kurdan, herdu cins bi hevra geleki bi aşti û xéraxîzî derbas dikin. Xeyda mezin ji rojekê zêdetir nedikîsand. Ew dibêjin, gerek xeyd zêdeyi rojekê nebe, gune ye, "çav dirjin". Bi gîlikî din di nav Kurda da comerdîya patîrxa li gelek e. Çêtir û pîvâna vê rastîya li ser Kurdan, nîrîn rûnişteyen Roslavlê ne, yên ku bi bûyerên vê salê ku li bajêr qewimi bûn girêdayîye i dema agir bi bajare wan ketibû û di nava sê seheta de sê parê bajêr bû xurê alava agir.

Heta vêga lêkolîn li ser Kurdan kêm hatine kirinê û, bêguman, Rûsyâ, Akademiya wê, dikaribû xizmeteke mezin ji zanistîye re bikira, heger bi xwe li ser eşîren Kurdan lêkolîna pêşin a bingehî bi fireti dest pê bikira. Di ser da ji, karê bi vî hawayî wê hukmê xwe yî moralî li ser Kurden ku li Turkiyê û Iranê dimînî, bihiştâ. Her wiha piştevanê ronakbirîye wê ji me razî bimana, wek em li Ingiltere dibînin, çawa roj bi roj guhîrî li hemberî wê lêkolînê xurt dibe, ya ku endemekî me li ser ziman, edebiyat û diroka gelê Afxan pêk anîye.

Bi bawariya Şilosér, Gêzênyûs, Êvald û zanayen mayîn, diroke de Kurden ew gelê jêhatî û aqilmend e, yê ku bi navê Xaldan ji ciyayen Kurdistane hate xwarê, daket Babi-lanê û li wir dewleteke xurt û pêşketî damezrand.

Li meydana etnografiyê hêja ye neku tenê Kurden pûperest/ezdi, her wiha birêwan û şîya/yêne bi bawariya gerokan bi xurtî jîyana kevnar iro ji diparêzin, bi kûrayî bêne kolandinê.

Ji bo lêkolîna zimanê gelê Kurd heta vêga tenê gavê pêşin hatine avitînê, lê şik tê tune, ku zimanê Kurdi wê bibe çevkanîye giranbâha jîbî vekirina diroka zimanen Iranî/Farîsi, yên ku hîn di bin perda tariye de

Çirok

Ma we hêcketina deve ditiye...?

Kerê min, ji wî devê ku belkî we ditiye hartir bûye. Xweş dizanîm ku baweriya we bi min tê, di gel ku bijîskê pîczade bawerî bi min nedianî, çend peyvên wî hîn têna min:

-Min ditiye seg, kûcik husa dike... gur jî... lê ker?..

Ev hîn nebûye...! Hikûmetê ji ji min bawer nekir, ma xewn e ku ez wê xwîna ji min dirî diherikî ya ji ber derengxistina dermankirina birfîna xwe, ji bîrbikim, lê hûn bi Xwedê kin, eger we deveyekî hêç dît, hûnê min agahdar bikin...

Ew kerê min i sipî ku berya nuha bi du salan min ew wek çerm û hestî kirribû, di destpêkê de min ew bi ka û ceh êm dikir û paşê ji tenê bi ceh.

Ü dû re, ma ezê ji were bi ci sünd bixum, bûbû mîna yekî ji malbatâ min...

Hetanî carekê ji caran "SELA-MO"- desten we radimise- Kurte-pist û peyvên cîranan ji min re şandin.

- Üsîfê Dêhno kerê xwe ji zaro-kên xwe bêtir delalî kirîye.

Ez roja xwe bi gazin pê re derbas dikim, ew guhêñ xwe miç dike. Tu carî husa nake, ji bîfi gava ku ez pê re dipeyivim, an ji dema zire-zira kera mî dibihîze. Min digo qey hevalek e, lê hûn dibînin bê ci bi serê min de anîye, xwezka we deve dîtibuya gava ku hêç dikeve...!

Sibhan ji Xwedê re, zivistanâku min ew kirribû, hûn dizinan ku ker zivistanan erzan in û havînan dema mextî û bîstanan buha dibin, a girîng ev e, ku wê zivistanê dilopek baran ji nehin-gîvî çermê zemînê, û digel ku takî sipî ji di porê min de ne-maye, min tu zivistanan halo çekûz nedîtibûn; belkî ew dem tê bîra we gava ku ji me re digotin: Mûyek ji mûyîn sîngâ "ŞEX" di nav rûpelîn Quranê de dîtine û ev ji nîşanek ji nîşanen roja qiyametê ye, hûn vêya xweş dizanin, a girîng ku Xwedê sitirand, bi dû ku me li ser tirban, li qiraxa bajêr cilêñ xwe berevajî li xwe kirin û me nimêj kir û me desten xwe hilgavtin bi hêla asiman de, baran bariya û tişte ku me dixwest, dawiya dawî asiman bo me hi-nart.

Lê bi rastî, tişte ku ez pê inirîm gotina yekî ji wan kesan bû:

- Ev zuhabuna (geht) ku bi ser me de hatî bû tev bela kerê te bû.

Hûn bawer dikin ku mirovê li hember rûnişti bû, wî ji pişta wê yekê girt û dewla xwe xist avê:

- Eger "PALO" li vir bûya wê hegê kerê bidayê.

Ü ev "PALO" yê han, wekû hin ji we dizanin, gwîzan ji firaxên bavê xwe ên kurkiranê didizî, ji lingan ker û pisik girê didan, û dest bi jêkirina terî û endamên wan ên cinsi dikir. Palo ciranê me bû, carekê dayika wî sindoqek mişt guh û teriyê ker û pisikan di bin axê de li kuncikekê ji yêñ hewşê, dîtibû.


"Palo" dev ji dibistanê berdabû, ev karê wî peywendi di navbera wî û dinê û naveroka wê de birribû. Bîna min pirr fireh bûbû

EBDELHELÎM YÜSİF

Tîzikêñ Kerê Sipî

Wenger

EHMED HUSEYNI



gava ku Palo çû serbaziyê (eske-riyê) û kerê min ji kirinê wî xelas bûbû. Lewra ez pir agahdarî wî dibûm, hetanî ku rewîst, rabûn û rûniştina wî, ez ditirsandim. Yek caran dest bi tîzikân dikir, di cih de min sedemzanî, ên zikîr û kerixî tîskan didin, vêya ji tecrûba xwe ya taybetî dizanim. Hew guh dide peyvên min, guhêñ wî hew miç dibûn. Cara dawîn min petêx û şebeş ji bîstan didan hev, ta ku wan di xurçikê xînim, min dît ku berê xwe bi du çavêñ beloq dide min.

Pêşî dev li zendê min kir, min got qey henekan dike, ez hâtim ku bi hewar kim. Tu tişt li dora me nîne, cî vala ye, leşkerên Tirkan ji hêla bakur de li ser şînor in, devê xwe, diranên xwe bêtir bi ser hev de anî, Xwedê wekil be, wekû petêxekî tenûrî dihatim ku bibim du felqe, ez pê re xeyidîm, min bi destê xwe û din çend kulm lê xistin, tiliya mezin ya destê rastî pelçiqand, min bi şîyan (qe-

wet) kir qîrîn, tilî cûtin, min xwîna xwe ya ku ji devê wî dinu-quşî, didit. Ez li kîleka wî hatim ramîdandin, Herdu simen xwe yên pêşî danîn ser sîngâ min.

Kerê min bûbû deve û bi hêç ketibû..., ma we deveyekî bi hêç keti dîtiye? Xwezka we dîtibuya, hemâ-hemâ bê hiş û ji dest hilanîn keti bûm, min dî ku ji min dûr dikeve bi alî rastê de, li ser rîya "Hazdê" min dît ku zilamek bi pêş de û bi alî min de têt; nikarim li ser piyan rawestim, mîrik ez li motora xwe kirim û nîfir li leşkerên Tirk dikirin. Ji min re got:

- Segên sînor gulle berdane te... ne?

Nayê bîra min bê ka min ci jê re gotibû;

Lê bi rastî zilam bû !!. Min xwe nedî ji bilî ku di nav destê, "bijîskê cil sipî" de me; ewî ji ez derman nedikirim:

- Tu qaçaxçî yî... ne?

Ü polis ji serê xwe dihejand, derewçin derdixistim:

- Ker û vî tişti bike?!!

Hetanî niha ji bi min re didin û distûn, ta ku xwîna min a ku di-

rije rawestînîn, pêwîst e derewan bikim, ev bi xwe bûye mercê rawestana xwîna min. Lê min derew nekirin, ker husa kiriye... ker... keer. AX.. AX... Ey serde-ma ker.

Ma hûnê bawer bikin bê kê di wê kîlikê de dergeh li me girt, kerê min ê sipî bi xwe bû, û hê xwîna min ya ku zuha bûbû, li ser dev û simen wî dibirîqî.

Min dibîhist yek ji wan dibêje:

- Nîşanen qiyametê ne.

Bi hêmîn ker nêzîkî min bû. Ji nişkê ve çavêñ wî fireh bûn, bi avê hatin dagirtin,

Teyê bigota qey dixwaze tiştekî -ku min nezanî - bibêje. Lê ne-peyi ví, bi hêrs zûriya, zîviri û bi bazdan berê xwe da qereqolê.

(.) Kurteçirok ji pirtûka riwîsevan a bi navê "Tîzikêñ Kerê Sipî" ji Erebi ha-tiye wergerandin.

Sekreteri Giştî yê Komela
Mafê Însanî, Akin Bîrdal

Li Cizîrê Dewletê Erişî Gel Kir

Heyetek ji Komela Mafê Însanî û ji Komela Rojnamevanê Hevdem, roja Newrozê li Şîrnex û li Cizîrê bû. Li ser navê heyetek Sekreteri Giştî yê Komela Mafê Însanî, Akin Bîrdal dîtin û muşahedeyîn xwe ji rojnama Cumhuriyâtê re got. Akin Bîrdal di hevpeyîna xwe de dibêje ku hêzên dewletê bûyer derxistin.

Wek tê zanîn, pişti qetîlama li Şîrnexê û li Cizîrê iddiya hukûmetê û hêzên dewletê ew bû ku yê ser derxistine xwedî giravi Apoci bûne. Lê tişten A. Bîrdal bi çavêñ xwe dîtine vê iddiya dewletê ji binde pûç dike. Ew di hevpeyîna xwe de eşkere dibêje "dewletê erîş bir ser gel".

Em beşek ji bersivê A. Bîrdal li jê pêşkêş dikin. **A. Bîrdal:** Sibê em rabûn, me cû temâseyî şâhiyên taxa Cûdi kir. Zarokan, pîrekan bi kîncen xwe yên cejnê govend girtin.

Sibê, grûbekê çûye goristanê ziyaret kiriye, me ew nedîn. Me ev hewa xweş terk kir û em cûn otela xwe. Li merkeza Cizîrê bi qasî 2000 kesî kom bûbûn. Însanen di her saflî de hebûn. Dixwestin her ser goristanê, militanen mirî zî-yaret bikin. Pêşîya wan hatibû birrîn, dora wan bi panzeran hatibû girtin. Em cûn dîtina Mudûrê Emniyetê. Dernekette bûyerê me jê reca kir. Me gotinê Serokwezîr anî bîrê. Me got, "Al, pankart nayen vekirin, û slogan ji nayen avetîn." "Me got, Serokwezîr gotiye ku" dema wiha be dikanon II gor dilî xwe pîroz bikin. "Mudûrê Emniyetê ji got" emê mudaxele nekin, û ji bo ku bûyer dernekeve ci ji destê me bê emê bikin." Li ser vê, me bi wan kesen ku di rîzên pêşî ya meşê de bûn têkîlî danî û gotinê Mudûr Emniyetê ji wan re got. Wan ji got ku bîryara me heye, emê pankarta venegerin û sloganana navêjin. Gotin bes emê herin goristanê.

Yanî hemû tiş bas derbas dibû?

A. Bîrdal: Belê, heya vira bas bû. Di nav gel û hêzên ewlekariyê de ji tu nexweşî tunebû. Lê di ser re çend deqîqe derbas nebû, me ji çavêñ xwe

Kurdistan bi amblemê...

Destpêk r. 1

Digel wêneyên xweş, hewaya demokratik, ji bertunebûna trâdisyonâ demokratik, xeletî û kîmanî ji xwe didin diyarkirin. Bereyi Kurdistan qanûna hilbijartînê derxist, lê bîr nebirin ku qanûneke li ser awa, wext û şiklê propagandayê ji derxin. Ji ber vê valayıyê kaosek mezin li Silêmaniye derket. Bi şev û roj, bê nîzam, hetta carcarna di eynî wextê de çend meş bi hev re çedibûn. Vê yekê rê li ber hin bûyeren nexweş vedikir. Ji bo çareserkirina vê valayıyê li ser awa, wext û şiklê propagandayê beyanen müşterek derxistin.

Wek nimûne, li Silêmaniye bi imza Noşîrvan Mustafa (Berpir-

bawer nekir. Hin di ser axaftina me ya bi Mudûrî Emniyetê re pênc deqîqe derbas nebûbû, hêzên ewlakarî bi megafonan ji gel daxwaziya belavbûne kirin. Di pê re ji panzêr cûn ser milet. A wê gavê ji dûr dengê silehan hat. Ji nav qelebalixa gel kesî sileh neteqandibû, hêzên ewlakarî ji her wisa. Li ser vê hêzên ewlakarî leşker, pûlis, tîm berê, hewayî berdan. Panikê dest pê kir. Qelebalix 200 mitro şûnde gû. Hin kes di bin nigan de mirin. Hinek di dema revê de li camen diakan qelibin, di nav xwînê de man. Destpêkiribû ji çar hawêl de dengê silehan dihat. Edî tişte bûbû bûbû.

Tu kanibû fîr bibûya gelo hêzên ewlakarî ji bo ci qerar guherandibû?

Bîrdal: Telefonek seyyar li meydane Cizîrê hatibû danîn. Mudûrî Emniyetê ji tîm agahdarî digit. Pişti rewş sa-

kin bû em bi Mudûrî Emniyetê re peyivin. Di navbera me de diyalekik pîr en-teresant derbas bû. Min berê pîrî, "ka heta ku pankart ve-neba û slogan neha-ta avetîn wê mudax-ele neba?" Ber-siva wi hazir bû: "Em emirquşî ne, me ji jor emir girt." Min israr kir, min got" Serokwezîr gotibû heta pankart nayen vekirin we yê mudaxele nekira." Li hember bersiva wi min zimanê xwe yê biçük daqultand. ji min re nebêje, "Lê çawa nebe wê vekirina"

Mesûliyeta bûyeren Cizîrê tu dixe hustîyê kê?

Bîrdal: Heger dewletê tanken xwe, panzeren xwe paşde bikişanda wê ev bûyerana yek ji nebuya. Dewlet fikri ku gava wiha bike wê prestijâ xwe wenda bike. Bê gotin, terefe berê erîş kir dewlet bû.

Ma mesûliyeta PKK'ê qet di bûyeran da tuneye?

Bîrdal: Bê şik heye. Di belavokên berî bûyeranda ji gel re digotin seri-hildin. Lê berî Newrozê bi du sê rojan PKK'ê şela xwe guherandibû. Di belavokên me dî de, daxwaz dihat kirin ku pankart venebin, neyên avetîn û şikleki sakın Newrozê pîroz bikin. Gel ji li gor vê belavokê hereket kir...

Weke ku tê zanin, piştî facia Lockerbie ku di sala 1988'an de balaşira Pan Am a Emerikayê li asimanen Iskoçayê li ser gundê Lockerbie infilaq kir, ket û 259 rîwiyên balaşirê û 11 kes ji wekî din mirin û pîrrişt hatin iddia kirin. Geh gotin Iran li pişt vê bûyerê ye, geh gotin Sûriye û Filistini û h.w.d. Lê dawiya dawî zengil xistin hustiyê Lîbyayê. Piştî ku Emerika iddia kir ku du kesen Lîbyayê ku navênen wan Ebdulbasit Eli Muhammed Elmegrahî û Elemin Xelife Fimah bûn, daxwaz ji Lîbyayê kir ku van du kesan teslimi wan bikin, Biritanya û Frensayê ji piştgiriya Emerika kirin û wan jî gotin pêwîst e ku ev du kes yan teslimi Emerika yan jî Britanyayê bibin, da ku li wê derê bêne mehkeme kirin.

Lîbyayê ev iddia qebûl nekir û got, ku tiştek weha hebe, emê wan li gor qanûnen xwe mehkeme bikin û piştstre got em dikarin wan teslimi Rêxistina Yekitiya Ereban bikin

Lê dewran dewrana Emerikayê ye ew nuha bûye "bavê" cihanê. Edî ne Yekitiya Sovyetan heye, ne ji tesîra Koma Welatên Bêali. Jixwe Rêxistina Yekitiya Ereban bi nav heye.

Anti-imperializm û Lîbyâ

Emerika bi tecruba ku di bûyera Tengava Farisi/Xelica Farisi/ de bi dest xistibû, Koma Miletan/UN/ xistibû dêwîre, careka din bûyer kir bûyera Koma Miletan û ji Konseya Ewlehi di 31'ê Adara bûri de qerara hejmar 748'an derxist ku Lîbyâ wan herdu kesan teslim neke wê li hember Lîbyayê ambargoya aborî û eskerî dest pê bike. Û wek tê zanîn ambargoyê di 15'ê Nisanê de dest pê kir. Seferen balaşiran ji û bo Lîbyayê bi temamî hatin rawestandin, Emerika keştiyên xwe yên ku di Derya Sipî de ne ber bi aliye Tengava Sirteyê ve bi rî kirin.

Weka ku tê zanîn Emerika di 15'ê Nisanâ 1986'an de bi alîkariya Brîtanya êris biribû ser Lîbyayê. Dema ku meriv helwesta DYât'î li hember Lîbyayê dizane, ne hewce ye ku cardin zêde li ser vê bûyerê bifikire. Ji ber ku mesele eşkere ye.

DYA ji vê sündê naxwaze dengen li dijî efendîtiya wê ya cihanê derkevin. Her çiqas Qedâfi wek berê beyanen tewşo mewşo nedîdan, cardin ji ew dixwaze

dersek bide Wî, heta ji derse ji wê de bikaribe rejîma wî hilweşine. Loma ji dema meriv li radyoya Dengê Emerika bi zimanê erebî guhdarî dike, gelek behsa muxalifîn Qedâfi dike û xuya ye ji bo wan kongreyek ji civandîye.

Doh hedef Iraq bû, iro Kuba û Lîbyâ, dibe ku sibê Sudan, Sûriye an jî Iran be. Pêwîst e pêşverû û welatparêz li dijî hegemonya imperializmê derkevin. Ev tişt ji bo me Kurdan ji weha ye. Tebî bê ku mesleheta gelê Kurd bixin talîyê. Bûyera Lîbyayê ne wek mesela Iraq ye. Wê hêrisi tu kesi nekiriye û wek Seddam gelê xwe nakuje. Ew her çiqas bê ser û ber be jî li dijî imperializmê derdikeve û piştgiriya tevgeren rizgarixwaz dike. Jixwe sedema sereki ya dijîtiya Emerika ya li hember Lîbyayê ji ev e. Her çiqas rejîma Lîbyayê rejîmek diktatorî be jî divê tu carî heqê Emerika nebe ku li gor daxwaza xwe destê xwe dirêji wê ke. Jixwe imperializm bixwe ji diktatori ye.

N. Eli

Ma Emê Qûna Dinyayê Rast Bikin?

Di vê hejmara Armancê de niviseke bi îmza N. Eli tê weşandin. Nivîs li ser gelşa di navbera Emerika, Englîstan, Fransa û Lîbyâ yê de ye. N. Eli li hember neheqîya ku Emerika û Xerb li Lîbyayê dîkin hew tehamul kîriye, lema jî rahiştiye gelema xwe û çûya gazî û hawara Qedâfi.

Hin Kurd hene li ruyê erdê xwe wek wekîli Xwedê dîbinin, tu dibê qey ew û qûna dinyayê rast bikin. Li kijan guçê dinyayê teşxelak derkeve berî her kesî ew şûrê xwe dîksînin û dîbin dost û piştavanê yekî. N. Eli, xwedîye nivîsa "Anti-emperializm û Lîbyâ" jî wer xuyaye ji van hakîm adil yek e.

Teoriya Senaryoyê

Wek tê zanîn Emerika û Englîstan, bi doza xistina balaşira Pan Am a Emerikî, ku di sala 1988'an de li ser Lockerbie piştî sabatajekê infilaq kiribû û 270 kes miribûn, du hemwalatiyê Lîbyayî dixwazin. Û Lîbyâ jî wan teslim nake. Li ali din Franse jî çar hemwelatiyê Lîbyayî ji ber xistina balafirek Fransî, ku li Çola Sahrayê ketibû û 170 kes miribûn, ji Lîbyayê dixwaze. Li ser van bûyeran ev her sê dewlet û Lîbyâ ketine qewriya hev.

Lê N. Eli iddia ku tiliya Lîbyayê di xistina her du balaşiran de heye pirr xeyrî ciddî û wek senaryo, yeke li dijî Qedâfiyê "Anti-imperialist" dîbin. N. Eli dijî:

- Dema ku meriv bi helwesta Emerika ya li hember Lîbyayê di zane ne hewcye ku merîv zêde li

ser bûyerê bifikire. Emerike na-xwaze li dijî efendîtiya wî ya cihanê deng derkevin.

Piştavanî

N. Eli ditirse ku tişte hat serê Iraq bê serê Qedâfi ji. Lema bala Kurdan dikşîne ser vê tahlükê û dibêje:

- Duh hedef Iraq bû, iro Kuba û Lîbyâ ye, dibe ku sibê Sudan Sûriye an jî Iran be. Pêwîst e pêşverû û welatparêz li dijî hegemonya imperializmê derkevin. Ev tişt ji bo me Kurdan ji wiha ye.

N. Eli di bin xêliya "Anti-imperializm" de bi zanîn ya jî bi nezanîn dibe berdevkû piştavanî rejîmen totalîter, diktator, paşverû û xwînrêj. Û bira Kurd ji me jî daxwaza piştavanîya van rejîmen diktator dike, ku ji wan Sûri Iraq û Iran di eynî wextê qatilên gelê me ne jî. Ez nabêjum em bîbêjîn "bijî" Emerike, Ingîlistan û Fransa! Û ji siyaseta wan re li çapika xin. Mirovki li dijî "imperializm" ne mecbûr e qatil û diktatorên wek Seddam û Qedâfi biparêze. Mirov li ser navê pêşverûtiyê çawa dikanê rejîmen wek Iran, Iraq, Sûri û Lîbyayê bipa-

rêze?

Bêtalîhî

Lê N. Eli diparêze. Ew, diktatoreki wek Qedâfi hevalbend û piştavanî tevgeren rizgarixwaz dibîne. Ew wiha pesnê wî dide:

- Lîbyâ her çiqas bê serû ber jî li dijî imperializmê derdikeve û piştgiriya tevgeren rizgarî xwaz dike.

Û wek tê dîtin li gor N. Eli, "Sedema sereke ya dijîtiya Emerika ya li hember Lîbyayê" ji esas ji ber vî qerekterê Lîbyayê tê.

Yanî Emerika û Xerb, ji ber ku Qedâfi mirovki pêşverû ye û "piştgiriya tevgeren pêşverû" dike, lema bela xwe tê dane û dixwazin wî bixînîn. Û ji ber ku em Kurd ji tevgereke pêşverû ne, lazim e ku em jî li dijî Xerbî derkevin û diktatoren wek Qedâfi biparêzin û bibin parêzvanê rejîma wî ya totalîter.

Bi dîtina min, tişte ku N. Eli di nivîsa xwe de parastiye ji bo Kurdeki welatperwer bêtalîhî ye. Lê weşandina vê nivîse di Armancê de jî hewqasî bêtalîhî ye.

Zinare Xamo

Radyoya Dengê Amerîka dest bi weşana Kurdi kir


Radyoya Dengê Amerîka roja 25'ê Nisanê dest bi weşana zimanê Kurdi kir. Nuha programa wê her roj 15 deqiqe ye û di meha Çiriya Pêşîn(Oktober) de wê bîbe seatek. Radyo li gor seeta Swêd, di nivîsa 05 û 05.15 û li ser pêlîn jîr weşana xwe dike.

25 Mitro 11850 MHz, 31 Mitro 9540 MHz, 42 Mitro 7100 MHz

Weşanênu Nuh

Amadekar: Rohat

Ferhad Shakely, Kurdish Nationalism in Mem û Zin of Ahmed-i Khanî (Di Mem û Zin Ahmedê Xani de Netewiya Kurdi), Weşanê Enstîtuya Kurd li Brukselê, 146 rûpel, Bruksel, 1992



Lêkolîvan Ferhad Shakely bi xwe Kurdê Iraqê ye, nuha li Swêdê diji. Ev lêkolîna wî, li ser de-stana Kurdi ya netewî Mem û Zin e, berî ku wek pirtûk bê çap kirin, di sala 1983'an de wek xebateke zanîsti li Swêdê bi zimanê Ingîlîzi hatîye amade kirin ji vê lêkolîna sala 1983'an pêk hatîye. Lêkolîvan angorî zaniyarîyê dîrokî, civakî û hunerî naveroka vê afirandina nemir analîz dike. Ev cara pêşîn e ku bi zimanê Ingîlîzi li ser Mem û Zin û nivîskarê wê Ahmedê Xanî lêkolînek tê weşandin.



Dr. Celîlê Celîl, XIX. Yüzyıl Osmanlı İmparatorluğu'nda Kürtler (Di Sedsala Nozdan a İmperatoriya Osmanî de Kurd), Weşanê Özge, 228 rûpel, Enqere, 1992.

Ev xebata Celîlê Celîl cara pêşîn li Moskovayê di 1973'an de bi zimanê Rûsî der çuye. Werge-ra Tirkî Mehmet Demîr pêk anîye. Di vê çapa Tirkî de, ji der orijinalê pirtûkê du lêkolînen mayîn yên ku di kovarên Özgür Gelecek û Deng de hâtine weşandin ji, di dawiye pirtûkê de wek paşkoyekê cih girtine. Ji alîyê din, di dawiye pirtûkê de çend wêne û nexşeyen (xerîte) ku bi naveroka pirtûkê ve girêdayî ne jî hene. Ev materyal ji alîyê Weşanxana Özge hatîne amadekirin. Nivîskarê pirtûkê Celîlê Celîl niha li Rewanê dijî û di besa Kurdnasîyê de wek dîrokzan kar dike.



Sakir Bilgin, Lasst die Berge unsere Geschichte erzählen (Berde Bila Çiya Qala Dîroka Me Bikin), Weşanê dipar-Verlag Frankfurt am Main, 146 rûpel, Frankfurt, 1991

Nivîskar di vê pirtûka xwe de angorî çend zanîyarîyê dîrokî qala zordestî, lêdanen li ser gelê Kurd dike. Sakir Bilgin di pirtûkê de cihékî fireh daye ser rewşa Kurden Tirkîye, li ser besen mayîn jî agahdariyê kurt tên dayin. Di dawiye pirtûkê de li ser pirsa Kurdan bibliyografiyeke piçûk jî cih girtiye.



Bertold Brecht, Horas û Kuryas (piyes), Weşanê Komela Jinê Kurdistanê Li Swêdê, 56 rûpel, Stockholm, 1992

Horas û Kuryas leystika şanoyî ya dawîn a B. Brecht e ku bi navê şanoyen perwerdeyi hâtine naskirin. Leystikên şanoya perwerdeyi bi gelemperî ji karker û zehmetkêşan re dihatin nivîsin daku rola xwe di civatê de nas bikin û xwe bibînin. Ev şano ya B. Brecht ji alî Zagrosê Hajo ve hatîye wergerandin bo Kurdi.

DİYARBEKİR Dİ "ÇİQLIK ÇARİG O!"

Hesenî GİRAN

21. 3. 1992

Eyro semedê roşanê Newrozî ra Diyarbekir di bêxeyja Berê Koy û Balıqçilar (Balıkçılar) semtanê binan hemînî di dikanî û kargehî padiyaybî. Mi meraq kerdinî, ez vejiyaya teber, geyraya:

Hewawo ki mi dî Quri Çesme (Kuru Çesme) û Hawa Alayı (Hava Alayı) di, ortey rayirî di lastikî veşnaybî, gedan û ciwanan dor-mare girotbi. Nizdi Seyrantepî ra, Sanayî ra duy adirê Newrozî ver bi Lojmananê Polisan û Baxleran ameyni. Baxleran di Yaniq Koşk (Yanik Koşk) û Goçmenler Caddesi di, rayirî ser o şari lastikî veşnaybî û piro kurri bîbî (ameybî pêser). Zafê wasiteyan ('erebeyan) nêguriyaynî (nêşuxiliyeynî), yew-yew guriyaynî. Ina ray dikandarê semtê Balıqçilar û Berê Koy bêxeyret vejiyay, esnafanê inî semtan wezifey xwi yo millî néard ca.

Mînibusa ki ez te de biya, senê ki Goçmenler Caddesi resay, - semedo ki ortey rayirî di adir wekerde bi- vinderti. Be'dî zorçiqiyam viyarti.

Heta êri ra Ofis di zî duy adirî veciya. Dormarey adirî di gore bî hezar (hınzar) tenî mîrdimî - zafane ciwanî- bî. Çend deqey ra pey ina grûbi ver bi Qosî Yoli (Koşu Yolu) rayir kewti.

Ez ki mînibusi reydi Lojmananê Ma'luman (Öğretmenler Koooperatifî) ver ra viyartîni, mi lojmanan ra cor, 'ersaya vengi di dormareyê adirî di yewna grûbi di. Cenîyan, camêrdan, keynekan û xorstan weyra govendi girotbî, kay kerdinî.

Mi bi xwi nêdi la vanî binaya HEP (Halkın Emek Partisi) ver di nizdi di hezarî mîrdimî govend û nazô kay kero. Leyla Zana û Xetîb Dicle zî dekewtî govendi. Vanî dewanê Diyarbekir di zî şarı adir kero û Newroz imbarkeñ kero.

Xeberi yena vanî miyanê çarşîye Pîranî di ciwanan -hîna zaf zî teleban- adir wekerdo, govendi girota.

Ez çewres û hîrê serre ya, ez hima newe veynena ki inawa roşanê Newrozî imbarkeñ beno. Labelê ez kekê xwi û pîy xwi ra persaya, vanî pancakes serri ra ver dewa ma di -ki yew dewa Pîranî ya- heme kes şîni banê xwi ser, banî ser o adir gilzey velgî ra naynî, veşnaynî. Dim a dewijan kay kerdinî û piskonî (piskûni) (1) ay adirî girotîni ver yewbinan daynî, keyfî xwi ardînî. Gama ki piskoni ver yewbinan daynî, vatînî:

-Çiqlik çarig o!

Yanî waştînî vajî ki yew çiqlikê adirî yew çarigê (2) xelli (nê zî cewî, gilgilî û çiyê inasaranî) yo. Seki (zeki) fa'm beno, adir 'elame- tê bereketi biyo. Dêmek ki çewres û panc-pancas (45-50) serran ra ver dewanê Pîranî di zî 'edetî imbarkeñkerdişê inî roşanî biyo. Dim a ver ra ver ra ino 'edet terk biyo. Mi bi xwi vîr nîno, labelê kekê mi vîr yeno. Madem ki kekê mi pancakes serre wo û yê (jey) vîr yeno, kê şîni vajî ki ino 'edet nizdi çewres û panc serri yo ki ma het ra wedariyawo (hewa niyawo). Ma ageyî mesela Diyarbekir û Newrozî ser. Duy adirî, şaristanî

ser ra kay keno, vila beno. Eyro Diyarbekir di qali qala Newrozî ya.

Ez şan di radyo ra pey hesiyaya ki Cizîra Botan û Şernex di mîrdimî semedê imbarkeñkerdişê Newrozî ra kısiyay. Wezîr Karanê Zerrî İsmet Sezginî xeberan di va hîris (vîst û des) ten kısiyayo. Moralê mi herimiya.

28. 3. 1992

Semedo ki Newroz di gelekkurdî kısiyaybî, eyro semedê 'ezaya millî ra Diyarbekiriji keyanê xwi ra nêvejiyay. Dikandaran di-kanê xwi nêakerdî, şoforan 'erebey xwi nêxebeitnay. Hewawo ki vanî hetanî teştarey Diyarbekirijan wezifey xwi ardbi ca, Labelê mîrdimanê hukmatî (polisan, tîman û eskeran) verra verra çiwa zorî reydi tanî şoforî ardî, vato "Ganî şîma bixebitî" û bi inawa çend hebî 'erebey xebityay. Teştarey ra pey, Berê Koy û Balıqçilar di zî dikandaran dikânê xwi akerdî. Te'da dewleti eyro teştarey ra pey gelekî tesir kerdî. Ez 'enê (goya) nêvejiyaynî teber labelê televizyonı va "Şar se ra heştay (% 80) vejiyawo teber, dikandaran dikânê xwi akerdî" û him şaro ki teber a bi him zî dikânê akerdey nawîfi (misnay). Ina ser ra ez teştarey ra pey vejiyaya teber. Ez şîya mi bi çîmanê xwi di: Berê Koy û Balıqçilar di dikânê akerdey bî labelê mehlanê binan di padayey bî. Televizyonu dewleteri risiyayan hewna (gilana) zurî

LA TI?

Bahri fek akerdo,
Ma paweno.
EZ asnav zana,
La ti?

Mi valê qay istora mi kihêl a.
"Istora kihêl isparê xo nedana
war o,
War o do ji ageyrena ser"

vate.

Ê min, him ez dawa war o,

Him niageyîre mi ser.

Betal û tirrek viyyê.

La ê to?

Ma kawranê jû ray bi.

Kam dewari bar da war o se

Ma ca verda û ray bi.

Raya rojî, şew;

Ê şew ji ma rojî şî.

Na juwer ra ji

Ma gunay war o û pay bi.

La ti?

Ger mi, ger istora mi

Aw û vewr di, lînc di, toz di

Qum û ray di

Ger è şopî nêveradayê...

Na şop ra dişmeni ma

fetînay,

Bahri ez û istor a fetînay.

Istor fetîsî, ez xelisyawa.

La ti?

Bê istor ray nêqedyena.

Ez bilîngî cay nêresena.

Ez raywanê rayda xo ya,

Ro istorxa xo geyrena.

La ti?

Pola ÇERMÜĞÜ

16. 4. 1989

ker-dibî. De ez ko (do) hinî senê xeberanê ina televizyonı ra bawer bika? Teber a çend hebî mînibusi zî xebityaynî labelê şaristan bê-veng bi. Gazetey heme ameybi-rotî, qediyyabî.

Ez yew imbazî di qali kena, vano:

-Ganî vera indi zorkerey -a ki Cizîra Botan û Şernex di bîbî-ino reaksiyon (tepki) rewna binawniyaynî, ma erey kewtî.

Şar Cizîrijan û Şernexijan rî zaf 'etirêno (yînî ver kiweno). Ez bi xwi semedê inî qetîl'amî ra şoke biya. Ay hesab biki ki rewna mi waşt ez Armaz rî binusa, destanê mi qelemi nêgiroti ki ez binusa.

31. 3. 1992

Eyro yew xeberi yena, vanî "Vîzér şan di se'et heşt ra pey gerillayan Pîran di, Kaşê 'Elikî ra tifingî qereqolê Pîranî ra, cay polisan û tîman ra nay. Pîranayışe çekan yew se'eti ramito, dim a vengê yînî biriyawo." Înî pêrodayîsi di Hewa (Havva) Kaya birindari bî (3).

Hewawo ki gazetey Cumhuriyeti eyro nuşto, Şernex û cayanê binan di rojê Newrozî ra hetanî ino hing neway û hîrê (93) tenî kısiyay.

Nuştîş gazetey Yenî Ülke (Özel sayı: 1/1992) gore, inî çayan di şarı Newroz imbarkeñkerdo: Şernex, Dêrsim (Tunceli), Melatî, Qerekose (Ağrı), Wan, Gumgum (Varto), Semsûr (Adriya-man), Wêranşar, Ceylanpınar, Entab (Gaziantep), Hezex (İdil), Sêwreg, Sirûc, Bêrecûk, Heweng (Bozova), Ruha, Cizîra Botan, Çolemêrg (Hakkari), İdîr (İğdir), Milazgir (Malazgirt), Çewlig (Bingöl), Erqenî, Eleh (Batman), Gever (Yüksekova), Kerçews, Silopî, Xarpêt (El'ezîz), Nişêbîn (Nusaybin), Diyarbekir, Licê, Fîs (yew dewa Licê ya), Çinar, Bismil, Bazarcix (Pazarçık), Erzirom, Qers, Xinûs (Hînis), Karaçoban, Mêrdîn, Stewr (Savur), Masertî (Ömerli), Kerboran (Dargeçit), Midyad, Şemrex (Mazıdağı), Tilermen (Kızıltepe), Dêrik, Izmir, Eskenderun (İskenderun), Estembul (İstanbul), Antalya, Edena (Adana), Cani (Ceyhan), Anqera (Ankara).

Hîrê sibay roşanê remezanî yo. Teber a vengê polîsî traffikî yeno. Te'lîmat dano şoforan, yînî (jînî) hagîdar keno. Tanînî rî cîrm birneno. Ma hinî vengê polisanî traffikî ra 'eciz bî. Hal û karê yînî inawa qîrrayış o. Roşan ra ver zî, pey zî çend rojî inawa ma 'eciz keni, gûşanê ma benî.

Teber a vengê rotokan zî yeno. Çarşu hindi sexlet o ki ti herri finî 'ard nêkiwena. Cayê kê rojanê binan di kê şîni panc deqîqan di şeri, kê eyro des deqîqan di ançax şonî.

(1)piskoni: İzimi (kolî) yan zî dara ki tam nêveşaya, nêmcet veşaya.

(2)çarig: Şîyes (16) welçegî heb (xele, cew û çiyo inasarenî).

(3)Hewawo ki gazetey Cumhuriyeti 1. 4. 1992 di nuşt 'eynî şewi dewanê Çermûgi ra Çolan (Eskibağ) di eskeranê Tîrkan hîrê gerillayî kişî.

TUEZLÎ BEG

Arêkerdox: Fiylikê QERESEGAN

murawa qirmîti viyena. Ca d' vazdena şina key paşê. Hunê çap wazena, vûna:

-Ez pey muron birey xwu peymawen.

Paşê rî benû derd. Vûn:

-Luyê, birey tû kûm û?

Luy vûna: -Birey mi ra vûn Tuezli Beg. Zaf gumreş yo beg û.

Una vûna û çap xwu gena şina.

Ruec biyîn çap ûna. Uniyeñ eg kişa çapi d' yo murawa qirmîti esta. Pyer pey 'ecêbi mûnenî. Hin şufe zerre d' nîmûnenî. Paşa luy ra vûn:

-Luyê, ti şîya se ti mi ver a zaf Tuezli Beg persenâ.

Luy şina arwûnî ra vûna: -Ez şin tue rî keyney Paşê wazenû. Ti pey qeyîl?

Fekê arwûnî şinu pey gueşû, vûnû:

-Luyê, pey mi qesmerekî melkir. Kûm keyna dûnû mi?

Luy vûna: -Ti qaris meb, ez in gurî virazen.

Roeç biyîn luy dûna ra şina key Paşê.

Pyer luy ver ra werzen we. Luy vûna:

-Ez semedê yo gurê xeyr a ümeya. Emr Hûmey, qewl Peyxamberî ti keyney xwu bid Tuezli Beg.

Paşa pey benû şâ, vûn: -La ez yi ra hîna gumreş beg vînenû?

Luy vûna: -Ti çend qalın ma ra wa-zen?

Paşa vûn: -Mal yî eyê mi ra zaf, eyê mi zî yî ra zaf o. Dayê-girotê ma çînyû.

Ca d' şû Tuezli Beg bigir biya, ma yobînû vîn.

Luy şina ver arwûnî, arwûnî ri neshet (nesîhet) kena, vûna:

Dewamê ci riperê 11. di

FERHENGEKÊ KELIMEYANÊ PALO'Y

argues: hargûş, aroş, arbêş,

awrêş, awriş

arwûnî: arbançî, arêyic

arye: arê, ayre

ba'ci: be'dî, ba'do, be'ndî,

be'ndîni, dim a

binêk: bineyk, biney, tikê

bîyîn: bîn

bye: bê

çap: qinati

ça ra: kue ra, kura ra, kotî ra,

kümca ra, konca ra?

ço: çew, yew

çowres: çewres

deyst: deşti

dêb: diyeb, dêw, dîw

dow: dewi

eg: eki, ke, ki, ek, eger

endhey: endîhey, indîhey, ehendi


eyê: ey, yê, ê

eyştiş: eştiş, vistiş</

NTT INTERNATIONAL ☎ 08-165100

Ji grûban re, ji dost û aboneman û xwendevanên ARMANC'ê re hîn erzantir e

Birger Jarlsgatan 107
113 56 STOCKHOLM

X a c e p i r s**Amadekar: S. Rêving****Çeperast:**

1-a- Navê yekem rojnameya Kurdi ku di sala 1898'an de li Qahîreyê bi insiyatifa Miqdad Mithet Bedirxan hatiye derxistin. b- Xwendina herfeke bêdeng. 2. a- Cihê ku li malan mirov tê de rûdine, radikeve (berevajî) b- Têjika mihê c- Li Kurdistanê teyrekî bi navûdeng ku wek sembola Kurdan jî tê nasin. 3. a- Temen, 'emir b- rî, rih c- Navê cûreke stranan (berevajî) 4. a- Peyveke pîrsê b- Ekspert, mutexasim (berevajî) 5. a- Karê aşvanan. b- Cehenem. 6. a- Navê gazeke kimyayî b- Paşpirtika daçekerê c- Kesê têhnî. 7. a- Jîna ku teşî dirêse 8. a- Navê nexweşiyekê (berevajî) b- Meywe c- Mirov li piyêw xwe dikin (berevajî) 9. a- Helbestvanê Kurd, di sala 1920'an de li gundê Laçin, nêzî Mahabadê hatiye dinê, bi navê " Tarik û Ronî " û " Nalleyî Cudayî " du

Serejêr:

1. a- Li Kurdistana iranê bajarek b- Têlek ji porê mirov 2. a- Enstrumenteke müsiqî. b- Dema rojê ya pişti muxribê (berevajî) c- Kesê bê erd, bê mal, bê cî. 3. a- Ne şev b- Ji bo kesê ku tiştekî nizane, ji bo ehmeqan tê gotin. (berevajî) c- Ap, birayê babê mirov 4. a- Navê welatekî cîranâ Kurdistanê b- Li Botan navê ciyekî ku Feqîyey Teyran lê xwendîye û keleheke kevin lê heye. 5. a- Daçekek (berevajî) b- ne, na, nexer (berevajî) c- Germiya agir d- Rih, kok. 6. a- Zilamê ku ji sohbet û rûniştina bi pirekan re hez dike. b- Sînonîma 'yek' 7. a- Pala ciyê (berevajî) b- êl, eşiret 8. a- Xweli, toz b- daçekek (berevajî) c- Navê kesê ku fesadiya Mem û Zinê li ba Mîre Botan kîriye û bûye sebebê serê wan (berevajî) 9. a- Kurtiya navê 'Ibrahim' b- Li Behdinan ji bo 'Koçer' an tê gotin, koçer. 10. a- Kurtiya pereyê Swêdî b- Hicûm, bi ser de cûn 11. Pêşnavê Troçki b- Hoste, kesê di sinetekî de zana be (berevajî) 12. a- Emniyet b- Dewartek c- mih, maka berxikan.

Bersîva Hejmara berê

Çeperast: 1-a) Cizîrabota, 2-a) İd, b) nelê, c) aras, 3-a) îrtî, b) oxîn, 4-a) erzincan, b) bar, 5-a) roava, b) ra, c) no, 6-a) pakistan, 7-a) ib, b) nebî, c) sa, 8-a) îrbic, b) mî, 9-a) nê, b) nr, c) partî, 10-a) dagirtin, 11-a) sebî, b)îro, 12-a) îroh, b) şâ, c) evîn

Serejêr: 1-a) cigerxwîn, b) bî, 2-a) id, b) ro, c) rîd, 3-a) Îzarib, b) aso, 4-a) Înriv, b) bingeh, 5-a) retnap, b) crib, 6-a) alîc, b) an, c) rîş, 8-a) onrib, b) pîr, 9-a) tax, b) asîman, 10-a) arîb, b) êr, c) iv, 11-a) ananas, b) tarî, 12-a) ês, b) ronahî, c) on

Gewet be ji te re,....

Di nivîsa xwe ya berê de min sê "dizênen nivîsan" A. Gernas, Keremê Anqosî û Yaşar Kaya cirmesûd gitibû û bi xwendevanên Armancê dabû nasîn. Her wisa min gotibû "diz" ne ev tenê ne, navê ên mayî jî di kompîtora me de ne. Min gotibû, berî ku ez wan yek bi yek derxim hember millet, divê ew bi xwe li xwe mukur bê, yanî sûcûn xwe itîraf bikin. Lî wek hûn jî dibînin van biraderen diz ne balkışandinê fêm dîkin û ne jî ji ifşayê ditîrsin bi kurtayî ji tu tişti sayisê nakin.

Dizi li her derê dînyayê súc e. Her welat li gor qanûnên xwe dizan ceza dike. Suûdî Erebistan li gor şerîfetê wan ceza dike, Tirkîye wan dike hefse, Swêd û welatên Ewrûpî jî gîriyê didin terbiyekirinek pedagojîk.

Îcar ê me Kurdan ne dewleta me heye û ne jî di vî warî de qanûnên me hene. Baş e ji bo ku em van mirovên xwe ji vî pişkê pîs xelas kin em dikanin çi bikin? Wek şexs baweriya min ewe ku van nivîsen min ên li ser "dizan" wê tesireke pozitif li van biraderan bike. Lî bêguman pêşniyaren din jî dikanin bêna munaşekirin.

Piştî nivîsandina vê meqalê Koyô Berz du beşê din jî ji nivîsa Dr. N. Zaza di rojnama Welat de weşand. Welê xuya ye ku Koyô Berz çav berra hemûyê nivîsê daye. Çimkî carê kitîb ketîye destê wî, heger rehmetî N. Zaza ji gorre rabê jî cardin nikane wê ji destê Koyô Berz xelas ke.

Her çiqas li hember qanûnê kesê diz ji kirinên xwe mesûl be jî, lê li alî din kesê malê dîziyê dikire û difrose jî pirr-hindik dibe şirîkê súc.

Li ba Cegexwîn û Ehmed Arif Realîteya Kurd

Bi navê li jor di 20.4.1992'an de bi amadekirina Federasyona Komelên Kurdistanê Li Swêdê, Profesör Tirk Serwer Tanilli li Stokholmê semînerek da. Tanilli bi kûrflî li ser jiyan û xebata edebî ya her du helbestvanan rawesta, ji helbesten wan çend nimûne pêşkê kirin.

Di dawîya semînerê de Tanilli bersîva pîsîn guhdaran da. Li ser kurdbûna Ehmed Arif û berhemên wî weha got: " Ehmed Arif bi zimanê Tirkî nivîsandiye. Di berhemên

edebî de ziman pir giring e. Kurdbûna dê û bavê Ehmed Arif, wek hunermend wî nake edibî edebiyata Kurdi. Ehmed Arif bi berhemên xwe ve helbestvanî edebiyata Tirkî ye." Tanilli, Cegerxwîn wek "nûnerê helbesta hevdem yê Kurdi" bi nav kir. Li ser pîsekê, wî got ku : " hevdembûna helbestê ne girêdayî forma wê ye. Ya herî giring naverok e û naverok helbestê dike hevdem."

Semîner ji zimanê Tirkî, bo zimanê Kurdi hat wergerandin.

TUEZLÎ BEG

-Birey mi, ma siba şin key paşê. Sîfto veryen qehwe yen. Fincûni qehwi yo yo firr bikir. Cixare ûn, cixarê xwu yo yo nefes bûnc. Welê cixarê xwu zerî weldeki ki. Ba'cî nûn yen, tuy tuy buwe[r], waço ma yarî nêkîr.

Ser sibê kuwenî raar. Benû nîzdî kîyâ Paşê, luy xwu zerre d' vûna. "Ez in hal ra inî birî (berû) kîyâ Paşê, Paşa ma ca d' ken teber" û ca di Arwûnî kena zit, vûna:

-Ti lewî ina kerra d' ruenîş! Ba'cî leza-lez şîna key paşê. Paşa vûnû:

-Luyê, la Tuezli Beg ho çâ?

Luy ca d' bermena, vûna:

-Yo felaket ûmey ma ser!

Laser ûme, mal ma, tef û talê ma, 'esker ma pyer pe de şî.

Tuezli Begi z' lewey yo tehti d' zit mend. Lez şîren, yî bixelesn. Niyû we z' pe de şînû.

Ca d' di ten şin Tuezli beg ûn, şûwenî, kincûn newû dûn pi ra.

Paşa vûnû: -Luyê, wa gûni şîma weşî b', wa mal şîyor. Qe ne zûmayma xelesya.

Tuezli Beg benî kîstê paşê d' nişnîne rue. Verî qehwe ûnî, Tuezli Beg yo firri d' qehwi qedînen. Cixare ûnî, yo nefesi d' şîmen. Yemeg yenû, sey gêcû wenû. Cem'atî Paşê pey 'ecêb mûnê.

Luy vûna: -Qusurî birê mi meuniyêni, lasêr birê mi kerd sey towşû. Nêzûn ho se kenû.

Paşa vûnû: -Towê (tawê) nîbenû. Înşalla nîzdi ra benû hol.

Çend rueci ser d' şînû, Luy vûna:

-Paşa, eg ti musa'de ken se ma hîn şînî. Merdimî ma zaf meraq keni.

Paşa ca d' çowres heb qatîr torî mal, 'esker û sîleh a kenû

Tuezli Beg keynê Paşê ra vûn:

-Qey ti lingê ina luy nigena n'erzena teber? Itiya pyer buy kota ci!

Luy hîdî hîdî sarê xwu kena berz, vûna:

-Tuezli Begi mino arwûnîyo giyin! Ti xwu r' veysûnî ver merdyen, mi ti kerdi waarr kiyî, waarr cinî, waarr mall!

Keynê Paşê sinî g' inê gueştarî kena, ca d' boxçê xwu pêşena, kuwena raar û vûna:

-Ez keynê Paşê ya, ez sinî yo arwûnî ver d' (het) vindena?

Luy vûna: -Arwûnîye mino tuezin, de ti şue Kêne Paşê açam!

Tuezli Beg vûn: -Luyê, mi kerd, ti mekir! Qey Hûmay a şue açam!

Luy vazdena, resena Keynê Paşê, vûna:

-Vewê, ti biya gêc? Tuezli Beg birê min o. Xwu ra ez yi ra vûn "arwûnî", "tuezin", "gêc". La gê ti inûn bikir? Yo arwûnî endhey mal û arazi çra ûnû?

Keynê Paşê inûn kena, gêra-

na. Yo wext ser d' şînû, Luy raysta bena niweş û mirena. Yo aşm sér cilûn a mûnena. Tuezli Beg uniyen eg Luy raysta merda, Luy benû baxçe d' finenî mezel.

Mi ra zur, Hûmay ra rayst, Mi tî eyş, şî vîrdê deyş, Ma her yowî r' yo saya sur kot,

Ma girot werd*

*Ina vistonik (sonik) perri Guevderî (Govderî) di vacêna (vaciye). Guevderî, yo nahîyey Palo yo. Dewleta Tirkan namê yê bedilnawo, kerdo Gökdere.

Mi ziwonê vistoniki nibedelna, sey yîno nuwشت.

Wezirê Karûbarê Derve yê Norveçê Thorvald Stoltenberg:

"Zulma ku dewletên dagirker li Kurdish dikan, min xemgîn dike"

Li Norveçê li bajarê Stavangerê, Komela Demokraten Kurdistanê li Rogaland di 10'ê Nisanê de Newroz piroz kir. Wezirê Karûbarê Derve yê Norveçê **Thorvald Stoltenberg**, serokê rôxistîna Stavangerê yê Partiya Sosyalist a Çep û çar şofêrên dosten Kurdistan ku ji bo Kurdên Iraqê kinc û pêlav berhev bîribûn, wek mîvan besdar bûn û peyivin.

Stoltenberg di destpêka gotina xwe de ji bo Kurdish kîfxwesi, pirozbahî û serketina xebatê da diyarkirin. Û gotina xwe wiha berdewam kir: "Naskirina min bi Kurdish re cara yekemîn dema ez di Koma Navnetewi de, di besê multecîyan komisertiya bilind de dixebeitim çêbû. Ji wê rojê heta roja iro heskiranek kûr bi min re çêbû. Ez dixwazim ji were bidim diyarkirin ku wek berpirsiyar û mumesileki Norveçî bi besdarbûna vê sahiyê kîfxwesiya xwe bidim diyarkirin". Stoltenberg li ser rewşa guhertinê li cihanê gelek mîsalen objetiv da û li ser zulm û tadeya ku li gelê Kurd tête kîrin, wiha got: "Ev zulm û tadeya ku hukûmeta Tirk û Iraqê li gelê Kurd dikan min xemgîn dike. Ji bona rawestandina zulm û zordesiya li ser Kurdish bête rakirin, ez bi xwe bi hukûmet a Tirkiyê, û iraqê re peyivim û bi taybeti di van şes mehîn dawîn de gelek caran bi serok û mumesilê hukûmeta Tirk re rûniştîm û me gelek mu-naqese kir. Di civîna koma navnetewi de ji bona derxistina hêzên aşîtiyê ji Kurdistanê ez bi xwe li dij derketim, ji ber ku hebûna vê hêzê li Kurdistanê ji bona emniyet û parastina gelê Kurd muhîm dibînim.

A din ji ez geleki kîfxwes im ku pirsa Kurdî ji ali pi-ranîya meclisa Norveçî tête parastin. Ew bi xwe dide xwiyakirin ku hikûmeta me alikariya xwe dide gelê Kurd.

Di meclisê de mu-naqeyek li ser Kurdish çêbû piştre ji min re gotin "tu geleki optimist i" cewaba min ev bû. Ez ne optimist im, ji ber ku her tiş ji ne baş e. Lî ez di problema Kurdî de geleki bi hêvi me.

Hêvi ji bi qasî jiyanê pêwist e. Bê hêvi kesek negihaye armanca xwe. Mumkun e bête súalkirin ku wê ji viya ci netice derê, bersiva min a ku ez bidim: Serketin ançax bi sebrê tête bi destxistin û ji ber vê yekê pêşniyariya min; divê Kurd xebata xwe bi sebr bi-domînin.

Di gelek şev, seminer û sahiyên Kurdî de gelek caran Norveçî ji Kurdish bêtir amade dibin. Wek şeva cejna Newrozê ji piraniya mîvanan besdar bi xwe Norveçî bûn. Bê guman berî wê xebat û aktivitîtek xurt ji terefe Komela Kar-kirêne Kurdistan li Rogaland bi awaki rôxistini pêk hatibû.

Wek belavkirina belavok, dawetname, plakat û anonsen radyo, televizyona lokal a Rogaland û hatina televizyona merkezi a Norveçî û amadekirina hevpeyivin û programek li ser haziriya cejna Newrozê.

Bi alikariya xwe ya inten-

nasyonalî ya bi gelê Kur-

re, Klûba Folklara Înter-

nasyonal li Stavanger bi

govendêne xwe yên geleri

programa şevê dewlemend-

ir kîrin.

Koma govenda zarokê

Kurd "Kulilk" bi govend û

cilêne xwe yên rengin dilê

mîvanan ges kîrin.

Koroya keçen Norveçî, bi

stranen xwe yên xweş hev-

kariya xwe bi gelê me re

dan diyarkirin. Cejna New-

rozê bi serfiraziyegele

mezin û bi dileki xweş tem-

am bû.

Şores/Norveç



Wezirê Karûbarê Derve yê Norveçê Thorvald Stoltenberg

BEROS

Mahmûd Lewendi



Monsieur Hemê viens-ici! Hero Hemê were vira!

Peyvek heye ku Fransiz jê re dibêjin "Monsieur" (Mösyö), Ingiliz dibêjin "Mister", Swêdi dibêjin "Herr" û Tirk jî dibêjin "Bay".

Gelo we zanibû ku Kurd jî dibêjin "Hero". Hero di axaftina rojane de, her gav ji ali xelkê ve tê bikaranin. Xelkê me, wê di maneya Mösyö, Bay an ji Mister de bi kar tîne. Lî qey ron: kbîrên me lê varneqilîne, an ji lê varc line, lê ji ber ci sedemî ye em nizanin ji bo ci di nivîsên xwe yên ceribandî û deribandî de bi kar naynin.

Belê Hero gotineke xwerû Kurdî ye, wek nan û avê. Her çendî hin kes hene di vê maneyê de Beg, Mir, Axa, Kak, Mirze, Berêz bi kartînin, lê bi min ew çewtiyek gelek mezin dikan.

Carê Beg bi Tirkî ye, ger em xwerûtiya zimanê xwe dixwazin, divê em peyvîn biyanî ji nav zimanê xwe biqewitînin û bavêjin.

Mir û Mirze ji gotinê welê ne ku di dewra zilm û zordestiyê de dihatin bikaranin. Yanî peyv in ku ji nav tarista-na feodalizmê tê, loma divê em qet wan bi kar neynin, yan na emê feodalân ji nû ve vejînin.

Berêz ji xwe gelek eyb e, çimki Berêz halê tewandî yê Beraz e. Beraz ji ji xwe hûn dizanin ci ye.

Her ci peyva Kak, ji xwe divê qet neyê bikaranin, çimki piir xerab e. Carekê li gundê me yekî ji yekî re got "Kak", li ser vê gotinê du 'esîr bi hev ketin, nozdeh

ROJEKÊ BILÎZE ROJEKÊ NA

Yekem:

-Di qûmarê de şansekî min î ecêb heye, rojekê dibim, rojekê didim.

Duwem:

-Ê tu ji rojekê bilîze, rojekê melîze!

TÊXIM POZÊ KÊ?

Dayik:

-Kurê min bes e tu tilîya xwe dixî pozê xwe.

Kurik:

-Baş e dayê têxim pozê kê?

1-Hero tu ci dikan?
Monsieur, qu'est-ce que tu fais?

2-Hero tu kuda dici?
Monsieur, où vas-tu?

3-Hero Hemê were vira!
Monsieur Hemê viens-ici!

4-Hero te nan xwar?
Monsieur tu as mangé?

Ger binivîsim nimûne gelek in. Lî bi min we êdi fam kir û ez welê bawer im ku ronakbîrên me ji êdi wê vê peyvika me ya xweşik di nivîsên xwe de bi kar bînîn.

Ha min ji bir ve kir ku bibejm; her weha peyveke ma ya din ji heye, ew ji di maneya Madam, Bayan de tê bi kar anîn ku ew ji Herê ye, divê ku hûn wê ji bîzanibin.

A JI TE RE DESTMÊJA TE

Apê Leto rojekê li ber çem destmêjê dire, pişti ku nigê xwe yên çepê ji dişo û tam li ser rabûnê ye, ferek sola wî dîkeve avê û bi çem de diherike û diçê. Apê Leto her çendî dike ax û wax ji lê bê Feyde ye. Ji qahra, ruyê xwe ji çem vedigerîne û tirrekê bi çem de dike û dibêje:

-Çemo, aha ji te re destmêja te, kanê fera sola min!

ÇEND MÊR KIRIYE

tu dibêji qey çavê diya te ji li mîra ketîye, tevîhev 13 ji Silîva, 12 ji mala kîrîva, yek Emerê Guhşelte, yek ji rehmetîyê bavê te, çirtik-pirtikên mayî ji nayêna bîra diya te!

ne karê aqila ye lê rast e

Amadekar: Hesen Mizgîn

* Amerîki di 16'ê Çirîya Paşîna 1986'an de li Key Largo yê li Flordia, DYB di bin avê de otel ava kîrin. Navê otelê Jules Undersea Lodge e û 9 mîtro di bin avê de ye.

Navê otelê ji navê niviskarê Fransî Jules Verne(1828-1905) ku ne tenê kitêba "Di 80'ê Rojan de Gera Dinê" lê kitêba

"Seyehata Di Bin Deryayê" ji nivîsan-dîye, tê.

* Kevokênu ku mirov ji bo postê bi kar tîne di seatekê de 176 km. difirin.

* Li dinê seata herî mezin li Kremlîn, li Moskovayê ye.

Seat di sala 1738'an de hatiye çêkirin. Giraniya wê 216 ton û bilindiya wê ji 6.09 m. ye.

* Di sala 1986'an de çêleka (manga) Aina û Elof Carlssonê Swêdi li gundê Bergen li Ålandê 4 golik di carekê de za. Ji ali istatistikê ve zayinek wiha ji 750.000 carê carek tenê diqewime.